

welat

Cepha
xiyanetê
PDK û YNK

Rûpel 6



Sal:1 Hejmar:34 11-17 Cotmeh 1992 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî



Gundekî Kurdan li Rewanê

Wêne: Rizgar

*Rê li ber xiyanetê girtî ye.
Gelê Kurd ji başûr ta bakur ji
rojhilat ta rojava dibin yek
deng û bang dikin:*

'Mala xayînan xera bibe'

Çûyîn û hatinên ber bi Enqerê, rûniştin û hev-
dîtinên bi MÎT û generalên Tirk re û têkiliyên bi
dijminan re, careke din Berzanî û Telabanî ber
bi xiyanetê ve birin. Di dîroka Kurdistanê de
felaketên herî mezin ji ber xiyanetê hatine serê
gelê Kurd. Îro, dîsa, kak Berzanî û mam Celal
bi neyarê herî dijwar, Tirkîye re bûne yek û li
pey vemirandina têkoşîna gelê Kurdistan in.
Lê gelê Kurd wek berê êdî li pey cahş û eşîran
nameşe, li dijî xiyanetê ber bi yekîtiyê ve diçe.



Gerîla
li her alî

Rûpel 3



Evîn

Rûpel 13



Hikûmeta
Kurdî

Rûpel 16

REWŞ



Abdullah Keskin

Bavê Felek

"Ay felek bo te dinalim
Bo çi nêrgis çirmisîn
Ew çima bextê me hoye
Em bê dost û bêkes in"

"Bavê Felek" (Ji ber ku di gelek stranên xwe de behsa felekê dike ev nav lê bûye Mihemed Şêxo di straneke xwe de bi vî awayî gazinan ji felekê dike.

Gazina mezin, divê em, em Kurd ji felekê bikin. Ji ber ku Mihemed Şêxo gelekî zû ji me veqetand, ji nav me bir. Çû û hew vegeheriya.

Bavê Felek, tu caran bayê felekê bi ser xwe de ne vegeherand.

Berî her tiştî hunermend e Mihemed Şêxo. Mezinbûna hunera wî hêdî hêdî bêtir tê fêmkirin.

Şêxo, bi tenê ne di nav muzîka Kurdî de, di nav muzîka dinyayê de ji cihekî taybêti digire.

Hin kes wî dişibîne Ruhî Su. Wî wek Ruhî Su yê me Kurdan di bînin. Nêrîneke çewt e ev. Bavê Felek bi termînolojiyêke klasîk nayê fêmkirin. Hunermendekî weke wî ji xeynî Kurdistanê incex li Hîndistanê, li warê mîtolojiyê pey-

Mihemed Şêxo; dengbêjê hemdem. Gazina Kurdan ji felekê. Mihemed Şêxo, çemê Ferat, gola Wanê, Mehabad û hemû axa Kurdistan. Strana gelê Kurd û Kurdistanê.

de bibe. Mihemed Şêxo bi serê xwe ekolek e.

Mirovekî bixwaze muzîka Mihemed Şêxo nasbike, divê jiyana gelê Kurd û rewşa Kurdistanê baş zanibe. Ev nayê wê manê ku muzîka Mihemed Şêxo bi tenê herêmî ye. Na!... Ji bo guhdarekî

Victor Jara, çawa zanîbûna jiyana civaka Şîlî, hasasiyetên insanên Şîlî pêwîst be, ji bo ku mirov muzîka Mihemed Şêxo ji baş nas bike divê Kurdistanê û rewşa gelê Kurd ji zanibe.

Bavê Felek, ji her alî ve bi qe-dera Kurdistanê ve girêdayî ye.

Gelek gotinên helbestên xwe ji hozanên Kurd bêhtirîn jî, ji Cegerxwîn girtine. Muzîka wî nakeve tu kategoriyan. Motivên gelêrî hene lê bi temamî ne gelêrî ye. Besteyên wî ne şîrovekirina pareçeyên gelêrî ne. Şivan, qasetên Aramê Tigran û Ciwan Haco yên dawî bi tevayî gelêrî ne.

Mihemed Şêxo; dengbêjê hemdem.

Gazina Kurdan ji felekê.

Mihemed Şêxo, çemê Ferat, gola Wanê, Mehabad û hemû axa Kurdistan.

Strana gelê Kurd û Kurdistanê.

Têbînî: Xwendevanên hêja, li ser, Mihemed Şêxo, jiyana û hunera wî ji me re binivîsin.

FERHENGOK

- Abor: İktisat, ekonomî
- Aborî: İktisadî, ekonomîk
- Ardû: Tiştên şewatê (Yakût)
- Bedew: Delal, spehî
- Bedewî: Delalî, spehîti
- Çêlik: Têjik, fêrxik
- Gilgil: Garis, gilgil (mısır)
- Girar: Savar (bulgur)
- Komar: Cumhûriyet
- Nasî: (Tanışma)
- Nasiya xwe dayîn: (Tanışmak)
- Kelepûr: Jêmayî, mîras (kalit, birikim)
- Bê navbirrî: Xweser, bêsekin (kesintisiz)
- Navbirrî: Navbirrî, tenefûs (kesinti, mola)
- Nivistin: Raketin, razan
- Nehiş: Ji dil çûyî (baygın)
- Neniş ketin: Ji dil çûyîn (bayılmak)
- Nuxumandin: Nixamtin (örtmek)
- Pars: (dilenme)
- Parsek: Feqîrok (dilenci)
- Parsekî: (dilencilik)
- Pars kirin: (dilenmek)
- Peşkilîn: Belavbûn
- Peşkilandin: Belav kirin, şemirandin, tar û mar kirin
- Piştîvan: Parêzker
- Pesn û sitayîş: Pesn û fort
- Şop: Dew, rêç

Mirov li Stenbolê Kurd be

Cewdet Kuşman

Ez ji herêma Serhedê, ji bajarê Wanê me. Di sala 1987 an de, ji bo kar hatim Stenbolê û niha jî ez li Stenbolê dixebitim. Em îsal, nezîkî cejna Newrozê bû, li zanîngeha Boğaziçi, di înceatekê de dixebitîn. Rojekê hevaleyê me ji xwe re durbînekî kiribû. Hevalan meraq kir ka dûrahî û nêzîkahiye çawa nîşan dide. Ji ber vê yekê derketin ser avahiyê, qata sisêyan.

Piştî mîzandîne, 20 deqîqe bi şûn de dû ekîp polîs hatin. Komser çewa ji ereba xwe peya bû got: "Durbîn kanê?" Tu kesî bersiv nedayê. Polîs hemû karkeran li ber înceate kom kir. Komser ji me pirsî: "Hûn ji ku ne?" Em şes kes, ji Kurdistanê bûn û yê din jî, ji Ordîyê û Tokatê bûn. Me Kurdan ji wan cihê kirin. Komser ji yê Tirk re got "Hûn herin ser karê xwe." Piştî ew çûn ser karên xwe, komser emir da polîsan ji bo ku li me bixin. Gotina komser jî ev bû: "Van heywanên zariyên heywanan bikutin" Polîsan bi vî emrî re dest bi lêdanê kirin. Bi jopan bi ser me de hatin û têra dilê xwe li me dan. Di dawiyê de hevaleyê me got: "Durbîn a min e." Li ser vê yekê polîsan dev ji me ber dan û bi ser hevalê me de beziyan. Li kolanê û li balkonan mirov li hev civiyabûn li me temaşe dikirin. Polîsek bi porê hevalê me girtibû û serê wê radikir li betonê dixist. Heyanî ku mirovan gazî kir: "Ev heywan in ku hûn ewqas li wan didin. Ma tu mafê wan nîn e ku hûn li ber çavên mirovan ewqas îşkence bi wan dikin." Hê ja dev ji me berdan.

Ew pîstiya ku bi me kirin, dikim nakim ji bîra min nare. Lewma min xwest vê nivîse ji we re bişînim.

Hevalên hêja rewşa karkerên Kurd ên li metropolan wiha ye.

Hawar Apo

Wegeriya gemiya mîra	Li ser gore te peya kinî
Di bin de maye apê me hemû	Kuç û kolanê Mîrdîne bi te nav
Kurdan	kirî
Apo me li te nexinê kirî peyize	Apo dilê min îro pîr xemgîn e.
Serme zivistanê.	Rabe rabe mîrxasi ku him agîrî
Apo emê Kurdistanê bi bûk nî	him sekmano.
Destê xwe hetanî ber hinek nî.	Raketin ji ter re nabe
Bi dijmin qahreki nî	Eyşa Bîlê

Welat

Berî her tiştî silavên şoreşgerî li we, daxwaza min pêşveçûna we ye.

Ev bûn çend hejmar Welat dixwinim, bi rastî ev rojname dilê gelê Kurd pîr xweş dike, cara yekê ye ku bi vî şeweyî, hemû bi Kurdî û her hefteyekê derdikeve; tiştêkî pîr giranbuha ye. Lê mixabin, hejmarên ku dighêne ba me pîr kêm in û gelek hejmaran jî em nabînin. Ji îro pê ve ezê jî alîkariya rojnameya Welat bikim ji ber ku Welatê gelê Kurd e û ez jî yek ji vî gelî me. Ezê helbest û tiştên di destê xwe de ji we re bişînim, hêviya me ew e ku em hemû di Welat de serfiraz û serbixwe bibin, ew roj nêzîk dibê.

EGER WELAT RÎZGAR NEBÎT

Eger welat rizgar nebit
Tim dê bijîm bê dost û yar
Dinya hemî malê te bit
Rûmet nade bê cî û war
Min nizanî bê niştiman
Tim dê bijîm bê dost û yar
Rojê hezar carî mirin
Xwe li min dipêçe rengê mar
Ne min tenê pîr di sitem
Milyonan wek min birîndar
Ma ta kengê ev rewş û jin
Bo min diyarî kin neyar?
Dê sedhezâr car kim tifû
Li pelên dîroka gemar
Bo herkesî rûgeş bû ew
Bo min tenê bêbext û har
Ger bizanim yek rê heye
Ku em derînin koledar
Welat paqij kin em bi zor
Ji rengê çewt û pîs û xwar
Li her cî û der wekhevî
Ronî be tev deşt û zinar
Ji nû ve em bêtirs bijîm
Bîrastî em bin evîndar
Ji bo çûna buhiştê ger
Dawetê em deynin li dar

Hoşiyar

Ji rexneyan netirsîn!

Serkeftina we daxwaziya me ye. Ji bo pêşveçûn û serkeftina we pêdivî bi we xwendevanan pîr heye. Rewşa we jî, wê ji hêla zanyarî, aborî û zanistî ve xweştir û geştir bibe. Xwendevanên we jî, bi têkoşînê hînî zimanê Kurmancî dibin. Ji billî we, îro tu dibistan û sazgeh nîn in ku civakê bi azîneke zanistî hînî zimanê wê bike. Vê baş zanibin ku, destên me û we, ne di hevûdu de be, ne ji me re û ne jî, ji we re tu pêşveçûn serkeftin pêk nayê û çênabe. Her wiha divê hûn rexne yê xwendevanan li xwe bipejirînin.

Berî niha bi demekê, heval I. Ömerî, li ser xaçpîrsa di nava rojnameya Welat, hejmara 15 de bi çewtî derketibû, we tu bersiv nedan rexne yê wî. Ji ber vê yekê, ew xaçpîrsa xelet ma û bi sedsalan wê di arşivên me û we de, di vî rûpelî de xelet bimîne. Hîna ew rast nebû ye, va ye xaçpîrsa 31 ê jî xelet û çewt derketiye.

Berpirsiyarê delal, divê bêhna we zehf fireh be û ji rexneyan re hûn vekirîbin. Rexne yê me xwendevanên we, ne dijîtiya we ye, lê belê destgirtî, hevaltî û piştgirtiya we ye. Hêviya me ji we ew e ku, hûn pêşengê hînkirina zimanê Kurmancî bin. Hûn ziman bi azîneke zanistî bi pêş ve bibin. Zimanê me yê dewlemend bi derewan nefiroşin.

Destûr, em bêne ser mijar

(babet) û rexneya xwe. Di rojnameya Welat, hejmara 30, rûpelê 15 de, Helbesta Sebrî Botanî, bi sernivîsa "sibe xwedî dewlet im:" Di vê helbestê de Sebrî Botanî zimanê Kurmancî kiriye li gorî ya xwe û helbesta xwe. Zimanê neteweyekî hilweşandiye (xopan kiriye) û pê helbesta xwe ava kiriye... ..

Her tiştê min bi Kurdî
Li bajêr û li gundî
Azadî xelatê min
Kurdistan welatê min
Hingê dîsa dirist im
Kurd im haştîperist im
Her çiqasî naveroka (hemî-lin) wê helbestê neteweyî jî be tu mafê kesî nîn e, zimanê Kurmancî bikin pêkenok an jî, ji xwe re bikin navgîna berjewendiyên xwe. Emê wan kujyarê (qatîlê) zimanê Kurmancî bipejirînin û têkoşîneke mezin û dijwar li dijberî (hemberî) wan bikin.

Berpirsiyarê rêzdar: Daxwaziya me ji we ew e ku, em mafdar bin, rexneyên me biweşînin, na em ne mafdar bin, bersiva rexneyên me bidin. Ji bo tu tişt nependî û veşartî nemînin. Berhem û nivîsên ji we re tîstî divê ji aliyê (rexê) şandekê (heyetekê) bête xwendin û sehê (kontrol) kirin, paşê bêne weşandin.

Silavên germ û şoreşî li we dikim.

Dara Omerya



Gerîla li her alî...

Navenda Nûçeyan- 2 Cotmeh 1992: Gerîla erîşî ser gundê (Bedlîsê) Hewek kir û 34 cerdevan kuştin. Piştî erîşa gerîla, hêzên dewletê bi panzeran ketin nava gund û gund dane ber topan û 32 gundî kuştin.

Riya Diyarbekîr û Mêrdînê ji alî gerîla ve hate birîn. Gerîla nasnameyan qontrol kirin û erebeyek PTT ê şewitandin. Di ceynî saetê de gerîla riya Farqînê û Diyarbekîrê jî birî, nasnameyan qontrol kirin.

Li Çiyayê Mazî, li gundê Derecik û Gürgöze 2 xayîn, ji alî gerîla ve hatin kuştin.

Li Siwerekê li gundê Kerteş xayînek ji alî gerîla ve hate kuştin. 15 kilometre nêzikî Muşê, gerîla çiftlika dewletê şewitand. 7 milyar zirarê dane çiftlikê.

3 Cotmeh 1992: Li Dêrsimê di nav hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket. Serbazek (Astsubayek) û leşkerek hatin kuştin, 4 leşker jî birîndar bûn.

Li Dêrsimê gerîlayan riya

Çemişgezek û Hozatê birîn, 6 saet propaganda kirin. Li Siwerekê jî gerîla rê birî û propaganda kir. Gerîla erîşî ser Çermûkê-kir. Avahiyên dewletê gulebaran kirin.

4 Cotmeh 1992: Li navça Motkiyê li nêzikî gundê İkizler konvoyek leşkerî kete kemîna gerîlayan çawîşek, û 7 leşker hatin kuştin.

Li Qoserê hizb-î kontrayek (Melle Şêxmûs) hate kuştin, yek jî hate birîndarkirin.

Li navbera Cizîrê û Nisêbînê gerîla rê birî û 2 saet qontrola nasnameyan kirin. Dawî jî otobusek ji firmaya Zümrüt şewitandin.

5 Cotmeh 1992: Li navça Pîranê (Dicle) li nêzikî gundê Gelinci di nav hêzên dewletê û gerîlayan de, şer derket. Serbazek û 2 leşker hatin kuştin 2 gerîla jî mirin. Gerîla li Nisêbînê erîşî ser 2 qereqolên sinor kirin. Leşkerek kuştin gelek jî birîndar kirin. 2 gerîla jî mirin.

Li Nisêbînê polisekî ku nivê

şevê li dîwaran li dijî PKK'ê slogan dinivîst, ji alî mîlîsan ve hate kuştin.

Li Hezo li hêla Şelmoyê, gerîlayan tesîs û birên Mobil û TPAO yê şewitandin. 500 milyon zirarê wan çêbû.

Li Serêkaniyê 2 hizb-î kontra hatin kuştin. Li Hîzanê li gundê Boztepe, gerîla cerdevanek kuştin. Gerîla riya di navbera Meraşê û Entabê birî, nasnameyan qontrol kirin û 2 kes kuştin.

6 Cotmeh 1992: Li herêma di navbera Bazîd, Aralık û Ixdîrê de, di nav hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket. Di vî şerî de, serbazek û 2 leşker hatin kuştin.

Li Aydin'ê li taxa Ilcabaşî di inşata qereqola jendermayan de, bombe teqiya. Avahî xesar dît.

7 Cotmeh 1992: Li Kerboranê konvoja leşkeran ku diçû operasyonê, ketin kemîna gerîlayan 3 leşker hatin kuştin 2 jî birîndar bûn.

Li Batman'ê 3 hizb-î kontra hatin kuştin.

Li Cizîrê cerdevanek hate revandin.

Li Midyadê polisek hate kuştin.

8 Cotmeh 1992: Li Karakoçanê di navbera gundên Zexîlder û Sirpiçê di nav hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket. 9 leşker hatin kuştin.

Li Bazîdê (Doğubeyazît) gerîlayan Emniyetê û qereqola polîsan dan ber roketavêj û gulleyan; qereqol û avahîya Emniyetê xesar dît.

Li Batmanî 2 xayîn hatin kuştin.

HAWAR

Dilbixwîn

Osmanîzm; heya kengê?

Hefteya derbasbûyî ji bo Artêşa Dewleta Tirk, ji bo dayikên mehmetçikan ên perîşan û bê çare, ji bo Sezgin, Özal, Demirel û ji bo rojnamevan, nivîskar û rojnameyên Tirkan; hefteya reşgirêdan, şîngerandin bû. Buhayê leşker û serleşkerên Tirk ji mirîşkekê jî erzantir bû. Ne tenê ev; zûre zûra Demirel bi xwe nimûneyeke vê rastiyê ye. Sûcê me çi ye? Bila neçin Cûdî, Gabar û Herekolê, leşkerên wan li Şemdinanê tirba xwe dikolin. Ez bawer nakim tu kesekî vexwendî ji wan re şandibe. Ax ne axa wan e, gul ne gulên wan in, ziman ne zimanê wan e, ezman jî ne ezmanê wan e; ji bo çi operasyon? Çima dagirkirin û vegirtin?

Weke ku mirov romaneke dramatikî bixwîne û têra dilê xwe bigirî, me rewşa dewleta Tirk di vê hefteya buhûrî

de wiha dît, **Bila her kes, dost û dijmin bizanibin. Kurdistanê em damezirînin wê di nav welatan de numûneyek be. Emê wê di nava gul û gufikan de bi bixemilînin.**

heya gihîştê dereceyekê ku Apê Silo bibêje: "Wellahî tu nema ku dilê min bi van bêbavan bişewite. Hele ji xwe re binêre heval, çawa xwe belengaz dikin. Lê hema şemîti şewitî kesê ku bi neheqî zorê bike dawiya wî ev e."

Me berê jî got, sala 1992' an ji bo me jî, ji bo we jî sala mirin û mayînê ye. Tewrê me eşkere û bi zimanekî xweş got, werin em li hev rûnin, we nepijîrand. Tiştêkî veşartî tune ye, we bi her du guhên xwe bihîst û bi her du çavên xwe dît ku serokê me çi got we gotina serok cidî negirt, we got: "Mirin ji Apo re" Binêrin li Şemdinan li Gabar û Herekolê şoreşgeran çi anî serê we, êdî taqet nema hûn birevin jî.

Di warê siyasî, leşkerî, û moralî (giyanî) de, ji xwe re li ser rewş û cendekê xwe yasîne bixwînin.

Herin Tehranê, hûn berê jî çûn. Herin Şamê, hûn berê jî çûn Şamê û Bexdayê.

Hefsarê xwe têxin hustûyê wî kûçikî û Çetinê xayîn li Ewrûpa jî bigerînin, bila hinekî ji we re bizûre.

Me bi xwîna xwe û karwanê xwe bi rêxist. Em bi xwe karwanê xwe dimeşînin jî, em bi xwe rabûn va ye em bi xwe dimeşînin jî. Herin, bi ser Refsencanî, Esed û Sedam de bigirî. Lê divê ji bîra we neçe ku, hûnê dîsa dûvê xwe bitewînin û veşerînin Enqereyê.

Belê, Osmaniyên ku 400 sal ereh xistine bin doliveriya xwe îro felek ji wan re xayîn hatiye bavo! Çare tune. Yan hûnê ji Kurdistanê derkevin an jî hûnê bimirin.

Ji bo me jî, yan emê bi serkevin an jî şehîd bin.

Xwîn; giyana (ruhê) serkevtinê ye. Serkevtin û serxwebûna ku xwîn ji bo wê nehatibe rijandin, gelekî erzan e. Em tu caran serxwebûna erzan naxwazin.

Bila her kes, dost û dijmin bizanibin. Kurdistanê em damezirînin wê di nav welatan de nimûneyek be. Emê wê di nava gul û gufikan de bixemilînin.

Kurdistan a me bû, ya me ye, wê yê me be.


Endamên koma muzîkê hatin girtin

Welat, Misirc- Endamên koma muzîkê, ya ku li Misircê (Kurtalan) wek Koma Berxwedan tê nas kirin, hatin girtin. Roja 7'e Cotmehê di şahiya dawetekê de, Koma Berxwedan bi Kurdî stran digotin. Dema şahî dom dikir, polîs hatin, govend sekinandin û endamên Koma Berxwedanê, Muzafer, Murat, Aydın û Abdullah girtin û bi xwe re birin qereqolê.

Xwediyê dawetê Muhyedîn Yıldız jî hate girtin û li qereqolê, komiserêkî pozê wî şikand.

Koma Berxwedan, ev çend sal in li Misircê û li dora Misircê di dawet û şahiyên de bi Kurdî distirîn. Ji ber vê yekê berê jî gelek caran, hatibûn girtin û bi hefteyan di bin îşkencê de mabûn.

Meşa dirêj li Swêdê



MIRIN JI KU VE Û ÇAWA TÊ BILA BÊ...

Şoreşgerê mezin û nemir Che Guevara, di sala 8 Cotmeh 1967 an de, li Bolívyayê ji alî hêzên faşîst ve hate kuştin. Em vî şoreşgerê internasyonal bi gotinên wî yên "yek-dudo êdî pîr Vietnam" bi bîr tînin.

"Mirin ji ku ve û çawa tê bila bê... ger diruşmeyên me yên şer olan bidin û bigihîjin her derê û ger çekên me dest bi dest bigerin û hinekên din li ser cendekên me, bi dengê mîtralozan û bi halanên şer û serfiraziyê lawjan bibêjin; mirin bi xêr û xweşî hat."

Che Guevara

Swêd, Welat-Şemîya ku derbas bû, li başûrê Swêd meşek dirêj çêbû. Armanca vê meşê ew bû ku, gelê Swêd li ser mafên Kurdan bêne agahdarkirin. Par jî meşek wiha hatibû çêkirin û gelek kes beşdar bûbûn. Meşa îsal ya dirêj 25 km. bû. Meşa ji teref Kurdistangrup û ERNK ve hate organîzekirin.

Ji ber ku xwendevanên Welat, navê ERNK ji nêz ve nasdikin, me pêwîstî nedît ku em vê hêza Kurdistan bi firehî bidin naskirin. Lê em dixwazin bi çend gotinan, Kurdistangrup bi we bidin naskirin. Kurdistangrup, komeleyek e ku endamê wê tev Swêdî ne. Armanca vê komele ew e ku, piştigiriya Kurdan bike, ji bo xelasbûnê. Ji bo vê armancê jî, komela Kurdistangrup pîralî bi hêza ERNK re kar û xebatê dike.

Meşa dirêj, roja 3'ê Çiriya Pêşîn 1992, de serê sibê saet li 9.00 an dest pê kir û zêdeyî sed kesî, ji bo vê meşa dirêj civiyan. Li bajarê Lund'ê bi moralek mezin û di bin ala PKK-ERNK û sembola pêşmergeyên qehreman ARGK'ê de meş dest pê kir. Meş, ji aliyê hejmarê ve, niv bi niv bû; nivî Swêdî û nivî jî ji kesên Kurd beşdar bûn.

Weke ku hate qalkirin, par jî meşek wiha çê bûbû û di destpêka meşê de polisên Swêd, bi şeweyekî nebaş nêzikî kesên beşdar bûbûn, lê îsal meş organîzekirî bû; polis jî dîtînen xwe guherand û şpasiyên xwe pêşkêşî beşdaran kirin.

Di dema meşê de hevalên Swêdî, ji bo piştigiriya şerê çekdarî ya Kurdan ku li Bakurê welatê xwe didin, alîka-

riya aborî dane hev. Paşî me heya devê rojnameya Svenska Dagbladet berdewam kir, ji ber ku ev rojname bi awayekî ne objektîv li ser rewşa Kurdan dinivîsand, bi şeweyekî pîrri hişk hate rexnekirin.

Dawîya meşê li bajarê Malmo'yê, li devereke navendî tamam bû. Li wir qiseyek bi Swêdî û Kurdî hate kirin. Rejîma Swêd bi hişkî hate rexnekirin, ji rejîma Swêd hate xwestin ku piştigiriya şerê Kurdan bike.

Beşdarên Swêdî û Kurd, tevan bi hev re, piştî meşê ev peyv gotin: Ji Swêd'ê em silavên xwe digihêjin têkoşîna gelê Kurd û em serkevîna wan dixwazin. Herwiha di karê ragihandiniyê de, em serkevîna rojnameya Welat, Yeni Ülke û Özgür Gündem daxwaz dikin.

GOTIN



Yaşar Kaya

Welat û welatparêzî

Dilxweşî û serfiraziya me ye, ku rojnameya Welat di 34 hefteyan de, 34 hejmar e derdikeve û ji wê rojê û vir ve, 7 meh derbas bûye, ev jî, ji niv salî zêdetir dike. Di nav van 34 hejmaran de, min bi tenê hefteyek nivîsara xwe negihandê Welat. Ew jî, dema ku em bi hevalan re, çûbûn Festîwala Kurdistanê. Kekê Muştakhan rûniştîye, heya hejmara 27 an, nivîsa kê, di kîjan hejmara Welat de hatibe çapkirin, nav bi nav nivîsiye. Destê wî, tu derdan nebûne. Bila Welat bi emrekî dirêj bijî, hevalên me yên ciwan xweş bin. Em giş, ji bo vê xebata wan, gelek tişt ji wan re deyndar in. Em nemirin, emê 6 salî û 10 saliya Welat jî pîroz bikin.

Welatparêzî, evîna dilan e, ger carek bikeve dilê mirov, êdî dernakeve. Evîna welat ji hemû evînan bilindtir e, di ser gişa re ye. Tu evîn nagihîje evîna welatparêziyê. Li ser welatparêziyê gelek tişt hatine nivîsandin. Welatparêziya her welatî li gor xwe ye. Ya me Kurdan jî li gorî me ye.

Li ser welatparêziya Kurdan pîrri nivîsar an jî pirtûk nîn in. Belê hêdî hêdî tene nivîsandin. Di nav gelek axaftinan de, em ji xwe re dibêjin we-

latparêz. Gelo em şert û şûrtên welatparêziyê tînin cih, an na? Divê em tim, li ser welatparêziya xwe bifikirin. Îro welatparêzên Kurd, jin û zarok, qîz û kur, mêr û mêrxas diçin mirinê. Ji bo welatê xwe, jiyana xwe feda dikin.

Hinek ji me jî hene ku, bi tiştêkî nizanin, tu tişt naxwînin, rojê 10-15 saetan radikevin, ji dema xebatê didizin, nezan in, çavên wan tu tiştî rind nabîne, li ser hev xeletîyan dikin, ji navê xwe pîrri hez dikin, dixwazin ku

Di nav gelek axaftinan de, em ji xwe re dibêjin welatparêz. Gelo em şert û şûrtên welatparêziyê tînin cih, an na? Divê em tim, li ser welatparêziya xwe bifikirin. Îro welatparêzên Kurd, jin û zarok, qîz û kur, mêr û mêrxas diçin mirinê. Ji bo welatê xwe, jiyana xwe feda dikin.

kes ji wan bi pêştir nebe. Dema ku yek tiştêkî ji wan dipirse, dibêjin "Ez mirovekî bêqisûr im." Û xwe diavêjin pişt dîwarê welatparêziyê. Kavan (kalkan)ên wan di destê wan de ne, xwe bi van kavanan diparêzin. Ev bi vî awayî nameşe. Mirovê welatparêz karê ku bikeve ser milê wî, dike. Westê xwe, zêdetir ji bo welatê xwe bikar tîne. Rastiye dibêje. Tiştên ku ji destê wî neyê, dibêje û xwe nade ber wî ka-

rî, dibêje bila hevalên ku ji heq derên vî karî bikin. Çavreşîyan nake. Ji bo welatê xwe, ji hevalên ciwan re mamostetiye dike. Dibêje, bila zarokên gelê min, van karan bizanibin, çawa be emê bimirin, mirov, bê mirin nîn e, bila gelê me, nezan nemîne.

Gel bê zanîna nabe. Divê em kêmasiyên xwe yê di vî warî de tamam bikin. Di nav me de, çend pispor hene ku ji me re nexweşxane û zanîngehan ava bikin? Çend akademîsyen hene ku Enstîtuyan deynin? Em mecbûr in ku kêmasî û qisûrên xwe bibînin. Avakirina welatêkî, ne tiştêkî hêsan e.

Welatparêzî, xebat e. Xebata ji dil û can e. Welatparêzî, zanatî ye, rêzanî e, biratî ye, evîna dilan e, kombûn e, xebata bi hev re ye. Bêyî vana, tu tişt nabe. Ronakbîrên Kurdan, bi rûmeta mamoste û seydayên xwe nizanibin, em nikarin bi pêşkevî. Mamoste û zanayên me rêça dîroka me ne.

Gelê Kurd, belengaz e, ketî ye. Her tiştê me bi rûmet e, bi buha ye, bi zêr û ziv e. Lê belê gelek caran di bin erd û xweliyê de mane û kesek bi wan nehisiyaye.

Divê kuştina kekê Musa Anter zû çavên me veke. Di saxiya wî de, me ji bo wî çî kir? Em lê bûne xwedî? Bi tenê mabû. Di tenê mabûna wî de, kêmasî û qisûra me gişan hebû. Dil dixwaze, ji îro pê ve, tu ronakbîrên me, mîna Memduh Selîm Beg, mîna Musa Anter bi tenê nemînin.

Dilê min tenê bi tiştêkî xweş e. Kekê Musa, dixwest bi vî awayî bimere, wilo jî mir. Sebra min ev e.

Bîranîna kuştina MUSA ANTER

Civîneke mezin ji bo bîranîna kuştina Apê Musa Anter.

Lawê gelê Kurd ê bêhempa, Musa Anter, ji alî hêzên tarî yên Dewleta Tirk ve hate kuştin. Ji bo şehîdbûna Apê me, civîneke mezin li 9 Çiriya Pêşîn, kate 18, cih: L.S.C., 69, Rue de la Chapelle, 75018 Paris, tê çêkirin. Vexwendiyên vî civînê ji welêt: Hatip Dicle, dêpûtêyê (mebûsê) HEP'ê yê Amedê û Yusuf Serhat Bucak, endamê avakar ê HEP'ê û xwediyê Yeni Ülke. Amadekarên vî civînê ev in:

- Komîta Kurdistanê li Parîsê
- HEP-Fransa
- Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêz ên Kurdistanê
- Rojnameya Yeni Ülke
- Rojnameya Özgür Gündem

Welat-Fransa

Amerîka li serê Dewleta Tirk da

Dewleta Tirk ji hebûna xwe ya Atatürkî de dewleteke girêdayî û nandoz e. Bi saya Yekîtiya Sovyetê, dewletên Rojava wê delalî kiribûn. Piştî hilweşandina Împêratoriya Sovyetê, dîsa Dewleta Atatürkî wekî kelakê li hember Ereban, Farisan û Grekan li ser lingan hiştine.

Mamo Cûmî

Dewleta Tirk ji hebûna xwe ya Atatürkî de, dewleteke girêdayî û nandoz e. Bi saya Yekîtiya Sovyetê, dewletên Rojava wê delalî kiribûn. Piştî hilweşandina Împêratoriya Sovyetê, dîsa Dewleta Atatürkî wekî kelakê li hember Ereban, Farisan û Grekan li ser lingan hiştine. Îro, Îsraîl û Sûriyê hêdî hêdî nêzîkî hev dibin; Ewropaya Mastricht jî hêdî hêdî dibe yek; Tirkîyê jî bo tirsandina Yunanîstanê nema bi kêrî wan tê; êdî şîr di vê dewleta çêlek de nema; stûyê wê kêrê dixwaze. Jixwe

çêlgurok îro pîrr in, ji Kurdan de bigre û pê de here. Li ser van şerên gerîla yê dawiyê li dijî qereqolên Tirkan, masmêdiya li Fransa tevan xwe livand, dewleta Tirk riswa kir û PKK ê wekî partiyeke rewa (lêgitime) nişan da. Rojnameya herî mezin a Fransîzî, Le Monde, sernivîsa wê tev ji bo şerê çekdarî yê PKK ê bû, wiha nivîsandî bû: "Di sala 1984 an de, di destpêkê de 200 gerîla hebûn; îro bi kêmanî 10.000 gerîla hene. Kesek nikare vê rastiye di piştguhê xwe re bavêje, hwd..." De îca, Süleyman Demirel xewna ji xwe re dibîne ga-

va dibêje. "Temenê (umr) dewleta me 600 sal e, kesek nikare wê perçe bike!"

Li gora medya dinyayê gemiya Amerîkî SARATOGA du mîsil bi "şaşbûn" li gemiyeke Tirkan daye. Qeptan û çend alîkarên wî emir dane gerîlayên ARGK. Nûçe derew e, rast e, lê vê derê Xwedê zane. Televîzyona Rastên Fransîz, TFL, bi fedîbûn nûçe bi awakî dida xuyan ku mirov dixiste gumanê. Herwiha, Dewleta Atatürkî, mêrxas di ser xwe re ne dîtine, tenê kariya Kurdên bindest û bêgûneh bikuje. Li vê dawiyê kampanya Amerîkî, SIKDRSKY 75 helikopter firotna Tirkîyê; 50 jê wê li Tirkîyê bêne çêkirin. Pîrr ne dîr e di meselên wiha de Dewleta Tirk berjewendiyên Amerîka bi cih bîne, îca, wekî gef-gurrekê balafirên Amerîka di ser gemiya Tirkan re çûn û du mîsilna baş lêdan. Dewleta Tirk bi roj mêrxas di ser xwe re dîtin!



Feridun Yazar

MGK ji HEP'ê çî dixwaze?

Navenda Nûçeyan- PKG (HEP) piştî kongreya xwe, ji nû ve bû hedefa Mehkemeyên Ewlekariyê (DGM) û tevî 11 rêvebirên PKG ê gelek mirov, hatin girtin.

Di civîna dawî ya Saziya Ewlekariya Neteweyî (MGK) de, PKG hatibû tehdîtîkirin. Li gorî generalan, PKG li dijî çarçova sistema parlementerî kar dike. Li ser van beyanên generalan, polis dest bi binçavkirina endam û rêvebirên PKG ê kirin. Tevî serokê PKG ê yê kevin Feridun Yazar, 11 kes ji rêveberiya PKG, piştî 10 rojên di bin çav de, derketin mehkemê. 3 kes ji rêveberiyê avêtin girtîgehê, yê mayî jî, berdan. Li gor beyanên Feridun Yazar, di bin çav de, polis bi giranî li ser tîkiliyên PKG û PKK ê sekiniye.

Wekî din, polis li mirovên ku di kongreyê de, slogan avêtibûn digere. Polis van mirovan jî kasetên vîdyoyê tesbit dike. Gelek delege û beşdarên kongreyê di bin tehdîda girtinê de ne.

Dewlet li aliyekî li Kurdistanê şerekî qirêj didomîne. Li metropolên Tirkîyê, Tirkan li hember Kurdan tûj dike û bi alîkariya van şovanan êrîş dibe ser xelkê ku koçî (göç) metropolan kirine. Li aliyekî din jî, partî komele û rêxistinên ku li dijî van kirinên dewletê dertên, an digire, an jî endam û rêvebirên wan, bi kirinê cure cure tehdît dike. Wan di mehkemeyên ewlekariyê de, mehkûmê zindanan dike.

PKG jî, ji van kirinên dewletê nesîbê xwe distîne. Ev bûyerên dawî jî, nişan dide ku, tu tehemula dewletê ji muxalifan re nîn e.

Girtiyên Bucayê di sînorê mirinê de ne.

Navenda Nûçeyan- Li girtîgeha Bucayê (izmir), greva birçîbûnê ket roja 26 an. Girtiyên li girtîgeha Bucayê, vê livbaziye (çylem) li ser êrîşên xerdiyanan û ji bo protestokirina hoyên girtîgehê li dar xistibûn.

Girtiyên di greva birçîbûnê de, roj bi roj ber bi sînorê mirinê ve diçin. Her roj, çend kes ji girtiyan radikîl nexweşxaneyan. Rêveberiya girtîgehê li ber çûna girtiyan a nexweşxaneyê asteng derdixe.

Girtî ji bo dawîlêanîna grevê hin şertan pêşkêş dikin. Ev daxwazên girtiyan bi listeyeke ku ji 23 madeyan pêk hatiye, ji rêveberiya girtîgehê re hatiye birêkirin Belê ji rêveberiya girtîgehê . tu deng dernakeve.

Di nav daxwazên girtiyan de, pejirandina statuya dîlîtiya siyasî, guhertina bernameya rêveberîna girtîgehê, hevdiyê vekirî û di derheqê îşkencekaran de dawê vekirî hene. Ji bilî van tiştan, hin mafên însanî jî, têne daxwazkirin.

Nameyeke vekirî ji bo Mam Celal

Ji mendalekî koçer ji bo Mam Celal!

Silavên pêçayî bi şîr û girî, ji bo mamê polîtîkzan Telabani (!)

Mamê hêja! Min çiqasî dixwest bi te re li paytextên cihanê bigerim. Li ser ewr û esmanan bifirim. Li ser piştê wan balefirên ciwan. Rojekê li Bexdê, yek li Enqerê. Rojekê li Parisê û yek li Şam a şîrîn. Jixwe London bajarê mijê cihê xweştirin e ji bo te. Îro jî li Waşingtonê, nextel a Berzaniyê kal camên şampaniyê li ser rihê wî dinoşî. Herwiha tu ne bi tenê yî, kurê ku çûye heyfa bavê bi te re ye.

Mam Celal! Ez mîna, hemû zarokên Kurdistanê pîrr hez ji reng û bêhna gulên dikim, lê ne ji wan gulên li pêşberî te û apê Berzanî li ser maseyên Özal û Demirel û Bush. Ez hez ji gulên çiya, deşt û baxên Kurdistanê dikim. Gulên paşayên te bêhna xwîn û mirinê ji wan tê, ew bi xwe jî şahidên xiyaretê ne.

Berî "Meşa mirinê" ez li Qamişlo bûm. Min tu dîtî, tu di nava gelê Kurd de bûy. Min hingê ji bavê xwe pirsî, ev kî ye? Ew Mam Celal e. Bavê min bersiv da. Bi rastî di mejiyê xwe de min digot: Tu serokê Kurdistanê ku di wan rojan de, dê were çêkirin î. Ew çend roj bûn ku gelê Kurd li başûrê welat serî hildabû û he-

ma bêje ew perçe rizgar kiribû, tu jî, ji Şamê, nizanî ji Ewropayê, an jî, ji Amerîka hatibûy, te dixwest sergovenda hazir bigrî, lê mixabin govenda gel bû, te jî baş pê nizanibû. Piştî çend rojan, ez hatim mal. Diya min li ber televîzyonê hêstir dibarandin. Koçerên riya mirinê bi rê ketibûn di nava berf û baranê de diqerîsin, ji jor jî, firokên faşîstê Sedam gule li ser wan dibarandin. Goştê zarok û kalan dibû şiv û taştê ya qertel û dubirakan, hema min da qîran, ez girîm, girîm û girîm.

Mam Celal! Dibêjin tu polîtîkzenekî jîr î (!) lê ez matmayî dimînim dema ez vê gotinê dibihîzim, ji ber ku tu, îro bi Demirel û Bush re rûdinî û baş tu dizanî ku destê wan di xwîna zarokên Kurdan de sor bûne. Ez bi xwe baş ji siyasê fam nakim, lê ez hevaltîyê baş dizanim. Gelo, bi rastî tu û Sedam û Bush û Özal heval in?! An tu hevaltîyê bi awayekî din fam dikî, ji ber ku tu polîtîkzenekî jîr î (!). Eger we (Celal û Berzanî) bi şaşîti li wan deriyan daye, em hevîdar in hûn zû vegezin ji ber ku ew riya qirkirina gelê Kurd e. Lê, na. Ez bawer im ez bi xwe şaş im, ji ber ku ew ne cara yekemîn e. Caşên şêst û şeşan, qirkirinên 1975 an, 1988 an, 1991'ê, li bîra me ne. Wekî din Dr. Şivan, Saîd Elçî, Sima Mayînî,

şehîdên çemê Hêzil, Sadiq Omer... Û yê din me ji bîr nekirine.

Gelo, îro hûn dixwazin çî bikin?! Rengê paseporta we ya sor ji xwîna kê ye? Lê ji bîr nekin dîrok dadgerekî durust û tund e, dilovaniyê (rehmê) li tu kesî nake. Kalê we Îdrîsê Bedlîsî jî digot, Tirk birayê me ne û riya we ya îro dihajot.

Gelê Kurdistanê nemaye meydana listika şeşrengê, ji bo ku hûn bi vî awayî pê bileyizin.

Em zarokên Kurdistanê jî, ji kuştin û talan û sêwîbûnê tîr bûne. Êdî, em jiyaneke xweş bi listik û stran di nava bax û gulên de dixwazin. Bi zîmanê xwe yê şerî, em dixwazin helbestên evîniyê bixwînin. Marşên Mehmetçik û faşîstan em naxwazin. Ev jî, bi destê gelê me pêk tê, ne bi destê Sedam û Bush û Demirel, ji ber ku wan destên bi qirêj herdem qirkirinê ji bo me anîne.

Di dawiyê de li gel kêfxweşî û camên şampaniyê yê şîrîn ji destê meta Mitterrand. Ez hevîdar im bi xweşî hûn vegezin mala xwe û rê bidin kesê ku bi rastî dikarin Kurdistanê şîrîn ava bikin.

Tu û kurê ku diçe heyfa bavê, bimînin di xweşiyê de.

Rikardo
Zarokê di kolanên
cihanê de windabûyî

Roja serxwebûn û azadiyê bi kenekî zelal ji pişt kupên çiyar ve dertê. Mizgîna jiyana nû li gelê Kurdistanê pîroz dike. Peyriyên buhiştê, peyamberên jînê gul û kulîlkên, bihara bê mirin bi xwîna sor dibişkivînin, çimen û daristanan dixemilînin. Şervanên azadiyê, karwanê jiyana mirovahî gavan ber bi tîrêjên rojê ve davêje. Gelê me êdî riya roja hebûn û hatinê dişopîne. Bi kevîr, dar û dirûşmeyan, ji heft salî heta heftê salî êrişên serkevtinê berdidin kedxwar û mêtîngeran.

Di vê dema hatinê de, dema mirin û manê, neviyên Idrîsê Bedlîsî bi hejmarên bilind serî radikin dixwazin bê rûmetî û xinizîya bavpîrê xwe bişopînin.

Di salên 1514 an de, dema kalê wan nokeriya dijmin dikir rewşa Kurdistanê pîr xirab û jar bû. Gel parçe, bê serok, rêber û rêxistin bû, ji bo vê jî, vî kalê bê bext xinizîya xwe mîna şerefeke bilind nîşan dida. Xwe û gelê xwe bi erzanî difiroto bi çend nîşanên sexte, welat jî, ji bilî firotinê parçe parçe dikir û şanazî bi vê xebata xwe dikir. Çarsed sal derbas dibin hê jî, tovê ku vî xayînî çandibû mîna stîrî û dirihên bê bext di nava yekîtiya gelê Kurd de şax didin. Dilê Kurdistanê birîn dikin. Nav pîr in: Inönü, Sezgin, Cewher, Çetin ê lawê Fatê, Meso û Celô (lawên ku diçin heyf a bavê...) dibêjin: "Ma dê çi bibe, bavpîrê me (33) wilayet firotin Osmanîyan, em jî, sê-çar wilayetên biçûk mîna

Rih dibe bost dijmin nabe dost


S. BİÇŪK

(Mûsil, Hewlêr, Silêmanî) dê bifiroşin paşayê nevi yê paşê."

Salên berê xiyaret û xinizî bê tole (ceza) derbas dibû, an jî, car caran dijmin bi xwe tola xiyaretê ji nokerên xwe dixwest. Dê fermo, vê serpêhatiyê dibêjin: "Di dema serhildana Şêx Seidê Pîranî de, serokê herêmeke Kurdistanê bi nav

Reşo bû. Mustafa Kemal (Atatürk) dixwest Reşo bide hêla xwe. Çû cem û gotê: "Ez dê te bikim walî, çiya û deştên Kurdistanê li ser te tapû (komar) bikim, lê tu jî, alî min bike, em Şêx Seid bipelixînin. Reşo bi dilekî xweş û vekirî ev dîtin pejiwand û mêvaniyeke mezin li ser şerefa (!) paşayê xwe li dar-

xist. Soz û peymanên mêran (!) bi hev dan. Di şûn çend mehan de, Şêx Seid û hevalên wî bi dar vekirin, paşayê bi soz û bext (!) hizirî û mijûl bû: Eger min ev kir walî û deşt û zozan li ser tomar kirin, ew jî, mîna Şêx Seid dê li serê min bibe bela. Eger min sozê xwe bi cih nanî jî, di-sa dê li serê min bibe bela û



"Ma dê çi bibe, bavpîrê me (33) wilayet firotin Osmanîyan, em jî, sê-çar wilayetên biçûk mîna (Mûsil, Hewlêr, Silêmanî) dê bifiroşin paşayê nevi yê paşê."

doza mafê xwe bike. A baş, ez wî jî, bi dar vekim. Misto hinart pey Reşo, ew xwest Enqerê û biryara xwe jê re belî kir. Reşo hewl da bergerî û lave lavê, aman! Ez naxwazim bibim walî, deşt û zozan jî, ji bo min nege-rek in, lê min bidar veneke, min alî te kir, me tev nan û xwê xwar. Lê paşayê xwedî soz û bext (!) got: Bi Xweda ez dê te bi dar vekim. Reşo ji paşê xwest ku wesiyetnameya xwe binivîse û got:

Ji min re dibêjin Reşoyê xatê Hey kerê ji keran ketî Dema te bê bextî li gelê xwe kir Te nizanî dê bînin serê te vê felaketê

Qewêtiya me ji bo hemû noker, caş û xwefiroşan: Dem hatiye guhertin. Em bûne xwedî artêş û hêz, xwedî serok, rêxistin û yekîti, êdî em hisabê tol a xiyaretê bi hêviya dijmin ve nahêlin. Gelê Kurdistanê bixwe wî hisabî dê bixwaze. Eger sed mehmetçik, Silo û Ozo li pişt we bin hûn nikarin bostekê ji xaka Kurdistanê bifiroşin. Gel şiyar e û rê girtiye. Tola bavê ne ji riya Enqerê û Amerika derbas dibe. Pêşiyên me gotine: "Çû tol a bavê qûn li ser kir."

Tole bi berxwedanê tê hildan, bi tenê berxwedan derman e, êdî bila rûpelên nokeriyê jî dîroka me bişewitin. Bi tenê neviyên me navê berxwedanê, çîrokên berxwedanê, destanên berxwedanê bixwînin.

Berxwedan jiyan e û jiyan berxwedan e.

Kontra Kurdî (Eniya Kurdistanî) û şerê psîkolojîk

Yekda Welat

Di van rojan de azînen (metod) Counterinsurgency (tunekirina serhildanan) a şerê psîkolojîk bi fermî xwe diyar kir. Eniya Kurdistanî ango Partiya Demokrati Kurdistan û Yekîtiya Niştîmanî

Kurdistan bi serokên xwe Berzanî û Telabanî ve despêkirin û delametên ku CIA, NATO û Daira Şerê Taybetî li Tirkîyê dane wan dixwazin bi cih bînin. Eniya Kurdistanî û "Meclisa Kurdistan" li Kurdistanê Başûr bûne Kontra û li dijî Têkoşîna

Rizgariya Neteweya Kurdistan derdikevin. Ev bûyer divê ne tenê bi xaleke netewmendî were analîzkirin û dîtin. Ev bûyer êrişeke imperiyalizmê û hevalbendên wan ên li dijî şoreşa Kurdistanê ye. Counterinsurgency metodeke, ku dixwaze bi her babetî gel û gerîla ji hev dûr bike. Ev metod di sala 1963' an de ji aliyê CIA ve hatiye nûkirin û niha rista xwe li 40 dewletên cihanê yênsîyan dileyize. Êdî li Kurdistanê hîç derfet nîn e ku bi şerê leşkerî, imperyalîzm serfiraz bibe.

Counterinsurgency dixwaze du armancan bi hev re bimeşîne: Yek guhertina civaka gelê Kurd li gora dîtina imperiyalizmê û ya duyemîn dixwaze PKK û gelê Kurdistanê, ku bûne yek, ji hev cuda bike. Ji bo guhertina civaka gelê Kurd, ku bibe xulamê imperiyalîstan, Berzanî û Telabanî bi dereceyê bilind di bin sîwana CIA û Tirkîyê de, karê kontra wek li Nikaragua û UNITA li Angola girtiye ser pişt a xwe û li dijî armancên gelê Kurd yênsîyan

hîn derdikeve. Ji bo vê yekê jî ev operasyonên Kontra Kurdî (Eniya Kurdistanî) pêk tinin.

Xaleke herî pêwîst ji ev e, ku dawiya şerê xelîca dudoyan gelê Kurd, ji Bakûr û Başûr tixûbên nerast rakirin û niha jî ber bi yekbûnê ve dimeşin. Imperyalîzm zane ku çiqas yekbûn di nav gelê Kurd-de çêbibe, herwiha hêza wî jî wê kêrî bibe Counterinsurgency, ji ber vê yekê, dixwaze ku erdimê gendîla biçik bike, daku nêzikayî di nav PKK'ê û gelê Kurd ên Başûr de çênebe û şoreş li vê derê cihê xwe negire.


Îro tê diyar kirin ku Amerîka, bi destê CIA navendekê (merkez) li Kurdistanê ava kiriye û ji vê navendê biryar digihîne Kontra Kurdî û leşkeriya Tirkîyê, ku bi çî awayî li dijî PKK û gelê Kurd derkevin. Li Kurdistanê Başûr civcivaction bi dereceyê bilind dimeşe. Civcivaction metodeke Amerîka ye, ku bi zanyarên xwe hinek projeyên pêwîst amade dike, daku Kontra Kurdî û mirovên wan karibin bijîn.

Kontra Kurdî bi xwe, di rojnameyan de, dibêje ku li dijî teroristan şer dike û Kontra Kurdî bi xwe dibêje ku rêxistineke Kurd e û ji bo mafên xwe bi "şerê" bi ber xwe dide. Tu car mafên Kontra û yênsîyan gel ne yek in. Kontra Kurdî jî tenê ji bo mafên şexsî û daxwazên imperyalîzmê kar dike.

Kontra Kurdî û imperyalîzm dixwazin wek li Afrîka-Başûr bi "Snaky Repression" (zordariya veşartî) gelê Kurd bixapîne û berxwedana gelê Kurd ji dilê wan derxe, ango bîrdozî û baweriya gelê Kurd ji serxwebûn û azadiyê rabike.

Ji bilî van metodên jorîn, her dem gelên bindest ku bi rêxistin ji bo mafên xwe serê xwe rakirine her dem serfiraz bûne û bi ser ketine.

Her mirovekî Kurd êdî baş dizane ku divê li kuderê cihê xwe bigire. Yek mirovek şerê birakujî naxwaze. Lê ev ne şerê birakujî ye. Ev şerê imperyalîzmê ya li dijî gelê Kurd e. Ev şerê han an Kurdistan an neman e.



Pirtûka CIA, ku çawa kontra livbaziya amade bike.



Ya mêrekî baş be, ya bivir û das
be, ya jî bimre ji xwe xelas be.
Gotina pêşiyên Kurdan

Teco û Mistefa

Teco zavê Mistefa ye. Mistefa xezûrê Teco ye. Teco bazirganekî pirr navdar bû hûrik û çûcîk ên gund nasdikirin.

Geryayê dinyayê, Xwedê rehma xwe lê bike zavayê min jî bû. Rojêke zivistana sar Teco li mala xezûrê xwe dibe mêvan, xezûr ji mizgeftê li ber malê erebeyeke hespan dibîne û dibêje mêvanekî me hatiye herhal. Dikeve hundir,

-Tu bi xêr hatî Teco

-Bi xêr û silamet. Kîjan bayî tu avêtî virê. Zarok çawa nin, baş in?

-Baş in, destê te maç di kin.

-Zeya me (keçê me) çawa ye?

-Kola te ye, ew jî baş e.

Mistefa banga bermaliyê dike.

-Besa dedê ji me re zadekî (savarekî) bikelîne.

-Li ser seran û li ser çavan.

Teco dibêje:

-Ez zad naxwim.

Mistefa dibêje:

-Besê tu bikelîne ê bixwe ê bixwe.

Besê zad dikelîne. Sifre



tê raxistin. Teco neçare û birçî ye. Kefçî li zad dike

pirr jî dixwe. Mistefa bangî Besê dike.

-Besê te got Teco zad naxwe, te dît çawa dixwe, ê bixwe ê bixwe, ku nexwe, ê here ku?

Ev çiroka min, ji bo hikûmeta Demirel û ji bo serleşkerê Tirkiyê ku dibêje, em bi kuşdaran re li masekê rûnanin.

Apo terorîst e, Apo mirovekî hov e, Apo bê ol û îman e. Dewleta me ya mezin tenezul nake ku, bi mirovekî wiha re rûnê ku şewr û peymanê bike.

Em neviyê Osmaniyan in, me tu cara serê xwe li ber dijmin xwar nekiriye. Ez dibêjim, aqûbet a (encama) Demirel û Doğan Güreş bibe aqûbeta Teco.

Hûnê rûnên lê hûn rê nabînin û dawiya metodên ve yên hovane jî nayên.

Em 16 milyon Kurd hene li Tirkiyê, 10 milyon rabûne ser piyan.

Emê vê carê kêrê pirr kûr lêxin.

Omerê

Ji bextereşan re nameyek reş

Li Stokholma xweş, hene çend Kurdên nexweş. Ji wan hinek kesên dilreş û zikreş guman dibin ku ew nivîsên mîzahî yên reş ên li quncika nequşka geş, min amade kirine beş bi beş! Divê ew devreş baş bizanibin ku em qet naşibine hevdu. Ew reş û ez beş. Dil û devê min wek hevdu ne. Durûtî û binfîsî li ba min tune. Lê, durûtî û binfîsî li ba we bûye kar û pişkê (meslekê) salane û gelek xweş...

Rêzgirtina min ji mirovan re heye. Lê, min ji tu kesî re negotiye "abî" ji bo ku ew ji min re bêje "aferîn keleş". Ez ne wek we hinekan kole û korê siyasî me û ne jî nankor! Bextereşyan li xelkê nekin û nebin dijşoreş! Hûn bi gumana nivîsandina min bi hunermendên quncika Nequşk ve jî didin wek koremar û dûvpişkên Ameda reş. Ji ber van sedeman ez dixwazim bibêjim ku ew nivîs ne yên min in ey hebeşên rûreş!

Amed Tigrîs

Wê ala te bilind be

Welatparêzê dilevîn, xebatkarê bê westan, nivîskarê jîr, evûqatê heqiyê şervanê doza Kurdistan, aligirê demokrasiyê mirovê hêja û çinara gelê Kurd Apê Musa, ji aliyê dijminên gelê Kurd ve hate qetilkirin.

Emê ala ku te hildabû, her tim bilind kin.

Li ser navê Partiya Keda Gel (HEP) a Misircê Şemsedîn Çiftçî

Em di rêça te de ne

Em çinara azadiyê Apê xwe Musa ji bîr nakin

Emê, di riya serxwebûna gelê Kurd de, doza ku wî dajot, bidomînin.

Li ser navê karmend û karkerên welatparêzên Misircê Huseyn Günbat Muzaffer Günbat

TÎR

Musa Anter



'Eyy Xwedê êdî bes e loo!'

Bi rastî ev gotin ji aliyê wî zimanê Xalê Musa yê şîrîn ve hatiye gotin. Ez dixwazim li ser Xalê min û apê gelê Kurd mamoste, rêber û nivîskarê hêja Musa Anter çend gotin bêjim. Fikra xwe bînim ser ziman lê belê ez difikirim ka ezê çawa bêjim û ezê çi bêjim. Çi bê gotin Xalê Musa tamam nake. Pirseke me Kurdan heye dibêje "Zikê zaroka tije ye devê wan nagere." Ev bi serê min hatiye dilê min tije ye lê zimanê min nagere. Xalo ka ezê çawa li ser te bêjim? Xalê Musa îro em gelê Kurd û gelek birayê me yên Tirk bi jiyana wî ya serpehatî zanin. Ji dema ku xwe naskir, li ser doza Kurd û Kurdistanê sekinî, dest bi nivîsandinê kir û roj bi roj xwe li pêş xist. Gelê Kurd heta gihîste vê rojê gelek xwîna sor û hêja rijand û gelek însanên me yên hêja şehîd dan

Pirseke me Kurdan heye dibêje "Zikê zaroka tije ye devê wan nagere." Ev bi serê min hatiye dilê min tije ye lê zimanê min nagere. Xalo ka ezê çawa li ser te bêjim? Xalê Musa îro em gelê Kurd û gelek birayê me yên Tirk bi jiyana wî ya serpehatî zanin.

Demaxoçe şehîd ket xalê min digot lawo, Husên! "Ezê bêjim çi ji bo te û giriya. Min go Xalo megrî. "Go, lawo birîna Husên di dilê min de gelekî diwar e û birînek kûr e." Min jê re got "Xalo xoçe di dilê me hemûyan de birîn e." Xalê min gelekî dilnêrm û çav bi ronî bû, min çawa ew gotin kir dîsa çirka wî tije bû û giriya ez jî pê re giriyam, birîna me yek bû, belê girîna me ne giriya aciziyê bû, giriya me ê biranînê û ê jiyaneke nû bû. Xoçe bi şehîd ketina xwe jiyaneke nû avakiribû, navê vê jiyane şehîd namirin bû. Xalê min emrê wî bû 74 sal bi vê bejna wî ya weke çinarê rast û wî porê wî yê spî tev de bi şewq, ev însanê me yê hêja û delal çinara me ya heftê û çar salî bi destê neyaran hate birrîn.

Xalê min digot, "Lawo ez naxwazim ez mirar bibim." Daxwaziya wî di nav karwanê şehîdan de cih bigire. Digot Lawo wê şehîdbûn bibe nesîbê min jî." Xalê delal ji bo navê şehîd gelek xebat kir, bi vê xebatê di 74 sal de bi hêzek xurt û rûyekî geş ket nav karwanê şehîdan. Digot can Wedat, xwezî ê dora te yek ji wana ez bûma û ji bo Husên jî digot "Üzülme yavrum, ez Xalê te me, sağ kaldığım müddetçe senin de yerine yazırım, yok eğer beni de öldürürlerse sana kavuşurum ki bu kavuşma en güzel kavuşma olur" Can Musa, Xalê delal tu gihîştî xwarziyê xwe û biraziye xwe û hemû şehîdên bêmirin.

Roj roja me ye, ew ê li ber tîrêjen rojê weke berfa ber zinaran bihelin, bi bîr û bawerî wê gelê me li ser rêka şehîdan bimeşin. Şehîdên me wê herdem ji me re rêber bin. Şehîd namirin.

Edla Deniz

Demaxoçe Husêyîn Deniz şehîd ketibû, Apê Musa gotibû "xwarzî ez ê ji dêla te ve jî binivîsim."

Lê Apê me jî piştî demeke din ket nav karwanê şehîdan. Ji bo ku daxwaza Apê Musa bê cih, em jî, jê re soz didin ku pênuşa wî li erdê namîne. Ji ber vê yekê, heta demeke dirêj em nahêlin quncikê Apê me vala bimîne.

Rê li ber xiyane tê girtî ye. Gelê Kurd ji başûr ta bakur ji rojhilat ta rojava dibin yek deng û bang dikin:

'Mala xayînan xera bibe'

Çûyîn û hatinên ber bi Enqerê, rûniştin û hevdîtinên bi MÎT û generalên Tirk re û têkiliyên bi dijminan re, careke din Berzanî û Telabanî ber bi xiyane tê ve birin. Di dîroka Kurdistanê de felaketên herî mezin ji ber xiyane tê hatine serê gelê Kurd. Îro, dîsa, kak Berzanî û mam Celal bi neyarê herî dijwar, Tirkîye re bûne yek û li pey vemirandina têkoşîna gelê Kurdistan in. Lê gelê Kurd wek berê êdî li pey cahş û eşîran nameşe, li dijî xiyane tê ber bi yekîtiyê ve diçe.

Navenda Nûçeyan- Dîroka partiyên Başûrê Kurdistanê, dîroka PDK, ê û YNK'ê ya îxanet, xwespartin û mejîngiyê ye. Ev 40 sal e ji rebenî û xiyane tê pêştir tu tişt nedane gelê Kurd.

Çiqas cara gelê Kurd ê Başûr têkoşîna xwe bilind kiriye û xwe nezikî azadiyê kiriye,

van serokatiyên paşverû û feodal, dev ji gelê xwe berdaye, xwespartiyê împeryalizmê û bûne sebebê qetlîam û birakujiyê.

Îro ji ev serokatiyên xayîn, di şûna ku gelê xwe ber bi azadiyê ve bimeşînin, bi MÎT û generalên Tirk û bi zilamên Pentagon re bi dizî rûdinin û

careke din li pey firotina Kurdistanê ne û li pey birakujî û xiyane tê ne. Bi êrişên xwe yê ku dibin ser welatparêzên Kurdistanê Başûr û gerîlayên PKK' û PAK'ê careke din rûyê xwe yê xayîn derxistin meydanê. Lê ew vî rûyê xwe nabînin û êrişên xwe zêde dikin.

Şerê di navbera Cepha Kurdistanî û Partiya Karkerên Kurdistanê de, bi beşdarbûna balafirên Ordiya Tirk re hîn gurtir û dorfirehtir bû.

Roja 1'ê Cotmehê, piştî ku sê qereqolên Şemdinlî ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hatin hilweşandin û zêdeyî 400 leşkerên Tirk di van qereqolan de hatin kuştin, hêzên PDK'ê li Kurdistanê Başûr erîş birin ser gerîlayên PKK'ê.

Di nav sê çar rojan de li gelek deverên Kurdistanê Başûr pêşî pêşmergeyên PDK'ê, dî re hem yê PDK ê hem jî yê YNK'ê bi hemû quwetên xwe erîş ser gerîla û alîgirên PKK'ê û PAK'ê kirin.

Di van êrişan de zêdeyî 20 alîgirên PKK'ê, yê bê sîlah hatin qetil kirin. Li gor nûçeyên gihîştine me, di nav pêşmergeyên erîşker de serbazên Ordiya Tirk jî hatine tesbît kirin.

Di rojên pêşî de gerîlayên PKK'ê nexwestin şer gurr bibe ji ber vî yekê jî tenê xwe

Ji nû ve ambargo

Rêxistina leşkerî ya PKK ê ARGK li Cizîrê û Silopî, ji bo ambargoyê belevok belav kirin. Di van belavokan de, PDK (KDP) û YNK bi hevkarîyê tene tewandarkirin. Di belavokê de, wiha tê gotin: "Ev şer, ne şerê birayan e. Şerê di nav îxanetkaran û eniya azadî û rizgariya Kurdistanê de ye. Xayînan PDK û YNK'ê, ji bo çend hestiyên ku avêtine ber wan, erîş ser partiya me kirin. Divê em di hemû cephayan de, bersiva wan bidin. Ji ber vî jî, me ji nû ve biryara ambargoyê girt."

Di belavokê de, rawestandina hemû tîkiliyên aborî û ticarî hate daxwazkirin.

Weke tê zanîn berî du mehan dîsa, ji ber hevkarîya Eniya Kurdistanê ku bi Tirkîyê re, tîkiliyên xayîn danîbûn, ambargoyek hatibû meşandin. Îro ev xiyane tî hevkarîya wan xwe bilind kiriye û Eniya Kurdistanî û Tirkîyê, bi hev re erîş dibin ser Partiya Karkerên Kurdistan. Ji ber vî jî, divê ambargoya nû ji ya berê xurtir û firehtir bibe.

parastin û pêşmergeyan îkaz kirin. Bes, bi zêdebûna êrişên pêşmergeyan re, gerîlayên PKK'ê jî nema tehemul kir û girt ser pêşmergeyan û hejmareke mezin kuştin û ewçend jî êsîr girtin.

Li ser van bûyeran serokê Partiya Karkerên Kurdistan, Abdullah Öcalan ji muxabirên rojnameya Özgür Gündemê re bi kurtî ev şîrove kir: "Ev hêzên hevkarên împeryalizmê, ku zêde bi ser me ve werin emê bi awayên sert cewaba

wan bidin. Îro li Başûrê Kurdistanê jî, me giraniya xwe daye ser têkoşîna serxwebûn û azadiyê. Bi pêşengiya PAK'ê îro li wir jî, li hember cepheya xayînan, cepheyeke serxwebûn û azadiyê heye.

Ger zêde bi ser me ve bîn emê li Başûr jî hêza gerîlayan dorfireh bikin. Ji niha ve dikarin bêjim ku gerîla wê li Başûr pêl û şax bide herderê. Hin kes dibêjin "Ma bi vî awayî şerê birakujî dest pê nake?"

Na, ew ne bira ne, ew hevkar û xayîn in. Ew şexsiyetên wisa ne ku di nav çil salan de Kurdistan bi pênc pera û heta erzantir jî firotine. Tiştên ku çil sal kirin li ba wan namîne. Wê hesabên kirinên wan bê pirsîn. Emê rê nedin kirinên wan ên ku encamên polîtîkayên faşîst in. Hikûmet û parlamentoya wan, her du jî sexte ne" Şerê di navbera gerîla û pêşmergeyan de li Lolan, Zaxo, Duhok, Silêmaniye, Haftanîn Şuberge, Zap, Xarkuk û li çend deverên din gurr dibe.

Li gor nûçeyên gihîştine me, di şer de heta niha zêdeyî sed pêşmerge hatine kuştin û bi sedan jî birîndar bûne. PKK pêşmergeyên ku êsîr digire ji xeynî qumandarên wan, serbest berdide.

Di nav van eşîran de hejmarek serbazên Ordiya Tirk, yê kincê pêşmergeyan li wan, hene. Li gor daxuyaniyên gerîlayan, PKK, di nav çend rojan de wê van serbazên Tirk derpêşe raya giştî û çapemeniyê bike.

"Dewleta Kurdî ya Federe"

Hikûmeta Kurdistanê Başûr roja 1'ê Cotmehê damezrandina Dewleta Kurdî ya Federe îlan kir. Piştî vî danezanê, pêşmergeyên PDK'ê erîş birin ser alîgir û gerîlayên PKK û PAK'ê

Bi vî helwesta xwe Cepha Kurdistanî dixwaze ji dewletên împeryalist û dagirker re xwe şîrîn nişan bide û desteka wan bistîne.

Lê, heta niha tu dewletê Dewleta Kurdî ya Federe nas nekiriye

Sûcê herî mezin xiyane t e

Êrişên ku Cepha "Kurdistanî" birin ser hêzên PKK û PAK'ê em şaş nekirin. Ji ber ku ev demeke dirêj e Berzanî û Telabanî amadekariyên van êrişan dikirin. Her çiqas, ji wan kirî bi dizî van haziriyên dikin jî, kesên ku pariyekê ji siyasete fam dikin, bi îstîkên Berzanî û Telabanî hisiyabûn. Helbet ev êrişên wan jî encama siyaseta wan a xwespartinê împeryalizmê û tîkiliyên wan ên bi dijminan re ye.

Di van mehên dawî de, Berzanî û Telabanî riya Enqerê kiribûn wek riya kaniyê. Rojek li tenîştê serokomarê Tirkîyê, roja din li ser maseya MÎT û generalên Tirk rûniştin. Hin hevdîtinên wan bi dizî li pişt deriyên dihatin çêkirin. Bê şik û guman, serokên Dewleta Tirk ne aşiqên bejn û bal û şal û şapikê Kak Berzanî û Mam Celal bûn. Niyeta Dewleta Tirk ew bû ku wan wek piyonan di dest xwe de bileyzîne û berde ser hêzên û alîgirên PKK'ê.

Rojnamevanên Tirk yê wan wek Hasan Cemal, Uğur Mumcu û Güngör Mengi, ku ew û MÎT a Tirk wek malbatekê ne, îtiraf dikin ku Berzanî û Telabanî bi generalên Tirk re, li pişt deriyên bi dizî rûniştine û ev planên êrişan hazir kirine.

Niha Berzanî û Telabanî, li gor mejiyê xwe, wê bi alîkariya Dewleta Tirk û yê împeryalist Kurdistanê ava bikin. Eşkere ye ku ew jî xetayan û xeletiyên ders nagrin, bi serê wan dikeve ku dijminê gelê Kurd wê bi destê xwe gelê Kurd azad bike.

Lê bi rastî, êdî xeletiyên ku Berzanî û Telabanî dikin ne xeta ne, sûc in. Ew sûcê mezin dikin.

Ew welatê xwe pêşkêşî dijmin dikin, ji vî sûcî mestir jî sûc tunin. Ew dikevin milê dijminê gelê Kurd wan hembêz dikin û gerîlayên PKK'ê dikujin.

Berê jî gelek caran van partiyên xayîn û eşîrî, xwe spartin dewletên

împeryalist û di dawiyê de pelîşîn, gelê Kurd ê Başûr jî kete nav dest û piyan.

Heta îro, sebebên hemû tîkiliyan serhildanên Kurd ên Başûr, ev siyasete PDK û YNK, yê xwespartin û birakujî ne û mesûlên qetlîamên di dema van tîkiliyan de çêbûne jî, serokatiyên PDK û YNK'ê ne.

Îro şerê ku PDK û YNK li dijî hêzên PKK, PAK û welatparêzan dest pê kiriye, sûcê wan jî yê hercar mezintir dike. Ji ber ku hem piştê xwe dane dijmin, Kurdistan pêşkêşî dijmin dikin, hem jî welatparêz û şoreşgerên Kurd qetil dikin. Sûcê wan divê bê ceza nemîne. Cezayê wan wê gelê Kurd bixwe bide.

Kurdên Başûr jî, ji siyasete û kirinên Berzanî û Telabanî aciz bûne û êdî ber bi PKK'ê û PAK'ê ve diçin.

Gel bi kê re be, ew ê bi serkeve. Ger ev helwestên PDK û YNK bi vî awayî dom bikin, di çavê gelê Kurd de ferqa wan û cerdevanan ji hev namîne.

Armanc: Tirsandin

Metod: Zilm û zor

Lîstika nû: Koçberkirin

Mînaka dawî: KULP



Şimex, Kerboran, Çukurca... Proveyên jenosîdê dawî li Kulpê ceribandin.

Navenda Nûçeyan- Sê kesên li dora 20 salî li sûka Kulpê (Pasûr), bi çekên otomatîk fişkan direşînin û direvin.

Ev sê kes kî ne, ji ku ne, nayêzanîn, tiştê ku tê zanîn; ew ne gerîla bûn. Bes ji aliyê dewletê ve wek gerîla tèn pêşkêş kirin û bi vî hincetê hêzên dewletê Kulpê dikin wek cejnem, rasterast hemû xanî û dikanan didin ber gulle-yan û agir berdidin gelek de-vevan. Bi sedan leşker û tîmên taybetî derdorên bajêr digrin û hin ji wan jî êrîşî ser dikan û

malan dikin. Li sikak û kolanan hêzên dewletê kê digrin, ji lêdanê bêhiş dikin, heqaret û neheqiyên derveyî mirovî li gelê Kulpê dikin. Ev zilm û talan çend roj li pey hev bi şev û roj domdike. Êdî mafê jiyane ji vî bajarî re jî, wek Şirnexê, nahêlin. Wisa dibe ku nema gelê Kulpê tehamul dike û hemû kes, jin û mêr, zarok û kal giş ji malên xwe derdikevin, dev ji her tiştên xwe berdidin û dikevin ser riyên koçmal dibin. Ji destpêka bûyerê ta sê rojan zehfên xelkê ji bajêr,

derdikevin derveyî Kulpê û li gundên dora bajêr bi cih dibin, hin ji wan jî ber bi bajarên din ve diçin. Di nav sê rojan de, wisa dibe ku, di Kulpê de ji leşker û polîsan pêştir pirr hindik mirov dimînin.

Li gor çend kesên ji Kulpê ku navên xwe veşartî hiştin, bûyer wiha qewimî: "Dema ev bûyera hovane dest pêkir, em li sûkê bûn. Me dît ku sê kesên bi silah, di nav qerebalixê sûkê de, çend car silahên xwe teqandin û reviyên. Ew ne gerîla bûn, ji ber ku şel û hel-

westên wan û dirûvên wan ne yên gerîlayan bûn. Piştî ku wan silah teqandin, sûk tevlihev bû û di ser re zehf derbas nebû ku her der bû wek roja mahşerê." Yekî din ê ku bi çavên xwe ev bûyer dîtibû û nedixwest navê wî bê dayîn, wiha qala bûyerê kir: "Di pey teqandina silahên re, van her sê kesan xwe ji çav dûrxistin. Vêca, hejmarek qomando, di dest wan de bîdonên benzîne, girtin ser Otêla Narîn, wan neh-deh kesên ku ji bo xwe-parastinê di bodroma otêlê de

xwe veşartibûn, derxistin derve û ji nav van kesan, xwediyê otêlê Abdulvahit Narin dan pêşiya xwe û bi kotek, cardin wan ew xist bodromê. Piştî demeke kurt, ji hundir dengê teqe-teqa çekan hat û agir girtê otêlê. Agir dora rojê jî dewam kir. Piştî ku otêl şewitî û agir vemirî, tenê hestiyên pî û ranên Abdulvahit Narin ma bûn."

Roja sêyemîn a bûyerê, qumandarê cendermeyan bi megafonê ev bang kir "Bila kes ji mala xwe dernekeve. Mala ku vala bibînim, ezê bişewtînim."

Li ser hedîsêya Kulpê, Re-yîsê Beledîya Kulpê İhsan Ülgen ev şrove kir. "Qumandar cendermeyan Recep Cömert berê ji xelkê Kulpê re gotibû ku tenê dengê silahêkê were, wê bajêr ji binî ve hilweşîne. Ez bawer im, wî ev daxwaza xwe jî anî cih. Ev senaryoyeke wek ya Şirnexê bû."

Komela Mafên Mirovan, ya Amedê jî, daxuyaniyek belav kir û bala raya giştî kişande ser vî bûyerê hovane û gazi hemû kes û komeleyên helwestkarên mafên mirovan kir da ku werin lêkolîn û lêgerînan li cihê bûyerê bikin.

Mebûsê SHP'ê ye Amedê, Salih Sümer jî got ku wê vî meselê li meclîsa Tirkîyê bîne ziman û berpirsiyarên vî wahşetê bide mehkemê.

Ji berê ve siyaseta dewleta Tirk, li Kurdistanê, ceribandina metod û listikên hovane ye. Armanca wê ew e ku gelê Kurd bitirse û dev ji doza xwe berde. Ev helwesta dewletê ji bo gelê Kurd ne xerîb e. Tiştê ku doh li Şirnexê, îro jî li Kulpê kir, perçek ji siyaseta wê ya fermî ye. Metodên xwe yên berê bi listikên nû li Şirnexê û Kulpê pêk anîn. Armanca wê eynî ye: Tirsandin. Metoda wê jî eynî ye: Zilm û zor. Tiştê nû jî zêdekirina zilm û zorê ye.

Li Tirkiyê pêla şovenîzmê

Navenda Nûçeyan- Dewlet, ji bo çareserkirina tengasiyên xwe yên ku di şerê Kurdistanê de ketiye navê, her roj metodeke nû diafirîne. Îro jî, ji xwe re yek dîtîye: Dijminatîya Tirkan û Kurdan. Dewlet di cenazên leşkerên ku li Kurdistanê hatine kuştin de bi destê polîs û faşîstan mitîng dide çêkirin û bi vî awayî jî bingeha êrîşên li ser Kurdan amade dike. Bi vî xebatê, armanca dewletê du alî ye. Ya yekemîn, bi van torenên cenazeyê, bi êrîşên nijadperestî û şovenîstî dewlet dixwaze Kurdên metropolan bitirsin, alîkariya ku ji têkoşîna neteweyî re dikin bibirrin, koç bibin û birevin. Ya duyemîn jî dewlet dixwaze bi van torenên şovenîstî û êrîşên li dijî Kurdan li her aliyê Tirkiyê belav bike, rayagiştîyê şovenîstî ava bike û bi vî awayî jî di şerê bi PKKê re dike de dixwaze paşîya eniya xwe zexm bike.

Bi rastî dewlet vî polîtî-

kaya xwe pêk tîne jî. Ev heftiya çûyî li navça Muğla yê li Fethiyê, ev polîtîka dewletê xwe nîşan da û hinek şovenîstên Tirk, bi hovîtiê êrîşî Kurdan kirin. Di 1'ê Cotmehê de cenazeyê leşkerekî Tirk ku li Kurdistanê hatibû kuştin hat Fethiyê. Bi beşdariya qeymeqam torenêk çêkirin. Di torenê de grubekê li dijî PKK û gelê Kurd dirûşme avêtin. Şûn de jî êrîşî ser Kurdên li Fethiyê rudinên kirin, bi kuça ve ketin nasnameya kontrol kirin. Di vî kontrolê de polîsa jî alîkarî bi wan re dikir. Ev êrîş piştî ku 3 cenazên leşkerên din hatin zaftir geş bû. Piştî ku ev cenaze jî hatin, êrîşkerên nijadperest har bûn li bajêr belav bûn û kîjan Kurdên ku dîtî li wan xistin, nasnameyên Kurdan qetandin, erebeyên zarokên Kurdan yên ku simîta difroşin qilubandin, êrîşî ser malên Kurdan kirin, di van êrîşan de saymanê HEP a

Fethiyê û hinek karkerên înceata birîndar bûn. Êrîşkeran ji Kurdan re digotin "Gerek e hûn ji vî derê herin." Û ji bo xelkê Fethiyê jî bixin nav van êrîşan de ji wan re jî digotin "Kurdên vî derê tev alîgirên PKK'ê ne û çêra bi me kirine." Di van êrîşan de erebeyê serokê HEP a Fethiyê jî şewitandin. Ji vî bûyerê rojek şûn de, di rojnameya herêmi "Billur" de banga mitîngêkê ku li dijî Kurdan wê hatibûna çêkirin derket lê ev mitîng çênebû. Tiştê ku bala me dikîşîne jî ev e ku di van êrîşên hovane de rêvebirên partiyên ku xwe "demokrat" nîşan didin jî hebûn. Weke SHP, DSP û DYP.

Serokê HEP a navça Fethiyê Hüseyin Atay li ser vî bûyerê wisa axivî: "Ev êrîş gava mirov bi giştî lê binhêre ji biryarên Yekîtiya Belediyên Egeyê û biryarên MGKê ne cuda ne. Ev êrîş bi destê dewletê tèn çêkirin.

Yekê din jî serokê Beledîya Fethiyê ku ji SHPê ye li Kurda baş nanhêre." HEP a Fethiyê lê nihêrt ku wê bûyer geş bibê demekê tabelaya xwe anî xwar û avahiya xwe girt. Lê şûn de dîsa vekir. Piştî bûyerê 40 malbat ên Kurd ji Fethiyê yê koç bûn.

Ev bûyerê li Fethiyê yê çêbû nîşan dide ku dewlet polîtîkayên xwe yên şovenîstî êdî di jiyane de pêk tîne. Lê herçiqas bûyerên wisa ne xweş derdikevin jî em ne bawer in dewlet bi vî polîtîkaya xwe serfiraziyê bibîne. Sedema yekemîn gelê Kurd bi biratiya gelê Kurd û Tirk bawer e. A din jî ev êrîş ne ji gelê Tirk tèn. Ev êrîşên nijadperest bi provakasyonên dewletê bi destê faşîstên sîvîl tèn çêkirin. Lê dîsa jî gerek e gelê Tirk û Kurd li dijî van provakasyonên dewletê şiyar bin û bi leyistikên dewletê nebin dijminên hev. Têkoşîn ji bo biratiya gelan e.

PÊNÛS



Amed Tigrîs

Di parlamento û Çankayayê de çend tîp

Ez dixwazim di vê nivîsa xwe de, li ser hinek tîpên dijminên Kurdan ên Kurdan ên parlementer rawestim. Mirov dikare wan wiha rêz bike.

1- Yên pîrik Kurd: Yanî ew kesên ku dibêjin an jî dê bibêjin "pîrika min jî Kurd bû" xwe dîrê wan bidin. Kesên wiha dijminê neteweya Kurdan ên herî har û dijwar in. Barbar in. Turgut Özal di navê grûbê de ye. Ew pîrik Kurd e.

2- Yên ku dibêjin eslê min jî Kurd e: Bi Tirkî dibêjin "ben de Kürt kökenliyim." Ew kesên ku dikevin vê grûba han cahş û xwefiroşên herî dijwar in. Dijminên binyata gelê xwe ne. Mehmet Kahraman jî vê grûbê re mîsala herî vekirî û berbiçav e.

3- Yên bav û kal cahş: Yên ku di dîroka Kurdistanê de, bav û kalên wan jî dewletê re cahşîfî sîxurtî kirine. Hikmet Çetin jî vê grûbê ye.

Ew kesên ku dibêjin an jî dê bibêjin "pîrika min jî Kurd bû" xwe dîrê wan bidin. Kesên wiha dijminê neteweya Kurdan ên herî har û dijwar in. Barbar in. Turgut Özal di navê grûbê de ye. Ew pîrik Kurd e.

4- Yên ku jî bavkujê xwe re dibêjin bavo: Ew ên ku dijmin bav û kalên wan kuştine. Lê ew ne li pey heya bav û kalên xwe digerin. Kamuran İnan jî wan kesan yek e.

5- Grûba gorenahl: Bi Kurdî ew kesên ku pîr xirabî dikin, dema dimirin jî ber xirabiyên wan êdî gor jî wan nahebinê û ji gora xwe radibin re dibêjin. Mîsala vê grûbê jî Fehmi Işıklar e. Fehmi piştî 50 saliya xwe bû Kurd. Lê pîr nema dîsa poşman bû û vegeriya cem hevalê xwe yê berê Erdal İnönü.

6- Yên sondxwar û tirsonek: Yên ku dikevin vê grûbê, bav û kalên wan bi mîranî ji bo Kurdistanê çûne. Lê dewletê wan daye sondê ku careke din tîkiliyên kar û barên Kurdayetiyê nebin. Ew jî li ser sonda xwe ne. Di zik û dilê xwe de, carnan Kurdbûna xwe hîs dikin. Di van mehên dawî de carnan İmza xwe davêjin bin hinek belavokan jî. Lê, ji tirsan dilerizin. Mirov dikare neviyê Şêx Seîd wek mînaka van kesan bide.

7- Yên nezan û lumpen: Kesên wiha dema serxweş dibin, ew dibin Kurd, dema hişyar in dibin Tirk. Heger keç, pere û meqam bibînin dikarin her tiştî û her kesî bifroşin. Salih Sumer jî van tîpan yek e.

8- Hinek kes hene ku di van salên dawî de, li parlamentoyê kêr-zêde behsa doza hebûna Kurdan dikin û behsa mafên wan ên neteweyî û demokratîk dikin. Bi dîtin min mirov incax jî van kesan re dikare bêje Kurd in an jî parlementerê Kurd. Ew parlementerên ku niha di nav HEPê de cihê xwe girtine mirov dikare wan wek mînak nîşan bide.

Heger mirov bijmêre, îro jî 100'î zêdetir parlementerên ku eslê wan Kurd in li parlamentoya Tirkan hene. Ji xeynî 18 kesê HEP'ê yê din hemû bi hikûmetê an jî muhalefetê re ne. Pîrraniya zarokên mirovên wan an bi gerîla re ne an jî di tîkoşîna demokratîk û neteweyî de cihê xwe girtine. Ew jî li parlamentoya Tirkîyê biryarên (qerarên) kuştin û wêrankirina welatê xwe didin. Wek ku Apê Mûsa digot "ev cins jî ziriyetên kewê ne. Kew zikreş e. Kew, xayîn e. Kewên kedî yê kovî bi nêçîrvanan didin kuştin.

Ev yek ne bi tenê taybetiyên xwefiroşên Kurdan e. Taybetiyên xwefiroşên her neteweyî û welatî ne. Dîsa taybetiyêke xwefiroşan heye ku ew jî li her derê dinyayê yek e, ku temenê (emrê) xwefiroşan kin in. Belê, ev jî baş û xweş e.

Tunebûna karektereke milî

Bindestiya dîr û dirêj şopên xwe yê giran li ser me Kurdan hiştine. Em Kurd di hemû warên jîyanê de, bi serdestên xwe ve hatine girêdan, nema em dikarin xwe jî wan girêkên kitifî rizgar bikin an bi bihustekê jî xwe jî wan dîr bixin û bi serê xwe bifikirin. Her tim divê hemû kar û barê me li gor kêf û mîraqa wan be; ango wek ku wan em jî xwe re "perwerde kirine."

Reşîd Sîmo

Bindestiya dîr û dirêj şopên xwe yê giran li ser me Kurdan hiştine. Em Kurd di hemû warên jîyanê de, bi serdestên xwe ve hatine girêdan, nema em dikarin xwe jî wan girêkên kitifî rizgar bikin an bi bihustekê jî xwe jî wan dîr bixin û bi serê xwe bifikirin. Her tim divê hemû kar û barê me li gor kêf û mîraqa wan be; ango wek ku wan em jî xwe re "perwerde kirine."

Îro di cîhanê de hîç tevgereke milî nîn e, ku ew otonomî jî serdestên xwe dixwaze, bi tenê em Kurd ta bi niha jî, piştî ewqas xwîn û xwêdan, çolbûna du milyon kes jî cih warên xwe, hîn jî li pey şopa xwestina otonomî ne û xwe davêjin hembeza dijminên xwe û rûyên wan radimûsin. Em bi vê yeka han radibin bi hinceta ku hîç dostên me di nav cîhanê de nîn in. Û tu dewlet piştigiriya me nakin. Hemû jî me re dibêjin: Pêwîst e; sînorên ku niha di Rojhilata Navîn de hene, ew bêne parastin û tu guhertin di wan de çênebe, ma alternatîv çî ye? Em bîgav in ku xwe bavêjîne bextê dijminên xwe. Meseleya bîngêhî ne ev e, meseleya bîngêhî; meseleya bîr û baweriyê ye, ka baweriyê ew serdariya ku barê gel hilgirtiye ser milên xwe bi çî tê û çî daye pêşiya xwe?

Her wiha divê jî bîra me neçe, nema gelên azadîxwaz qîma xwe bi federatîvê jî tînin, hemû dixwazin dewletên xwe yê milî ava bikin û bi serê xwe bijînin, bê ku miletekî din li ser an li ber wan be. Nîmûne va ye em dibînin temamê Sovyetîstanê jî ber hev hîlweşîya û 15 komarên serbixwe ava bûn û gelek miletên din jî di nav Sovyetê kevin de dixwazin, ku dewletên xwe yê milî û serbixwe bidin avakirin. Va ye Yugosloviya kevin jî li ser vî riyê ye û mala hevdu hilweşandin, kambax, wêran û kavlî kirin ka em binêrin jî wê jî çend dewletên din pêk tên. Bi tenê me Kurdan daye ser piştî otonomî û wê jî serdestên xwe dixwazin. Dibêjin "roviyek ne-

çû qulekê, hin hejek jî li pey xwe girêda." Hejê me jî ew e; ku em dibêjin otonomî jî bo Kurdistanê, demokrasiya jî, ji bo dewleta ku parçeyekî Kurdistanê di bin destên wê de ye. Ma me çî jî wan e?

Beriya heftê salî yekî bi navê Atatürk bi darê zorê şewqe û kumîk da serê me, hîn niha jî ew şewqe û kumîk li serê me ye û bi me gelekî şîrîn bûye û nema em dikarin dev jê berdin, tewir ew kete nav folklorê me jî û me stirand û got "Kemal bavê me ye, şewqe da serê me ye."

Berî şêst salî camêrek jî nav me Kurdan rabû û alfebeyekê latîni jî me re danî, da ku em pê zîmanê xwe binvîsin û pê xwendê û zana bibin. Evî camêrê han şewqe û kumîkan dane serê hin tîpan (ê î û) heye ku pê jî alfebeya Tirkî cuda bibe an heya ku ew bêtir bi kêrî alfebeya Kurdî tê û ew li gel hevdu sistemekê çê dikin û herwiha jî (^) tiştêke kevin e di alfebeya latîni de. Lê divê jî bîra me neçe ta ev camêrê han jî kete bin tesîra alfebeya Tirkî û du tîpên xwe wek alfebeya Tirkî li dawiyê guhertin (ç, ş), ew li pêşiyê wiha danîbûn (ch, sh).

Gelek li vî dawiyê jî nav me rabûn, xwestin ev şewqe û kumîkên han jî serê tîpan bavêjin. Ev çalakiya han bi navê nêzikbûnê jî alfebeya Tirkî "koletiyê" an bi navê hêsanîkirina teknîkî tîpe kirin. Hinek jî dibêjin: Em Kurd gelekî hîsî ne û guh didine hestên xwe bê ku guh bidin hiş û mejiyê xwe ku pê bifikirin. Ma gelo nasîyonalîzîm gava ku ne hîs û hest be, ew çî ye?

Em Kurd naxwazin hêdi hêdi em jî bibin xwediyê alfebeyêke cuda û bi serê xwe, heye ku hin bibêjin ma ev alfebeya han ne latîni ye? Çawa ewê bibe alfebeyêke Kurdî bi serê xwe? Erê eger me Kurdan jî, ji hezar salan ve an bi kêmanî jî sedsalan ve bi alfebeyekê nivîsandîba, heye ku wî ta bi niha qalibekî Kurdî bigirta û ev teq û reqa niha di nav me de, hîngê em jî xwediyê alfebeyêke bi serê xwe bûn. Ji ber ku dema em li bîngêha hemû alfebeyan bikolin û bigerin, emê bigihînin

encamekê, ku bîngêha hemûyan jî ya Fenîkeyan hatiye. Lê hêdi hêdi her miletekî bi borîna sal û rojan re û bi dirêjiya dîrokê karektereke taybetî dane alfebeyên xwe û kirine malê xwe.

Em dibînin tevî ku zîmanên Ewropîyan gelekî nêzikî hevdu ne, lê alfebeyên wan ne wek hev in. Ji bo nîmûnê mirov dikare bibêje Swêdî û Norwêjî yek zîman e, lê dîsa jî wan alfebeyên xwe wek hevdu danên. Ew kesên ku dibêjin em miletekî hîsî ne, ez bawer im, ew miletê xwe baş nanasin! Ger bi rastî em Kurd miletekî hîsî bûna, niha jî mîj ve dewleta me dê heba. Ma nasîyonalîzîm jî bilî hîs û hestan ve çî ye? Lê mixabin em Kurd dîrî wan hîs û hestan in û jî ber vî jî ta niha em di bin destê gelek gelên din de mane. Niha ew hest û hîsên ku me bi hev ve girêdidin nîn in, ku em bi êş, kul û derdên hevdu bihesin û wan jî xwe re bikin, destpêka girêdaneke milî û pê dev jî qil û qirêja kevin berdin û bi pey armanceke modern kevin û dewleta xwe ya milî bidin damezrandin.

Mirov dibêje bi Kurdî bipeyivîn, binivîsin û bifikirin; ew dibêjin ma zîman jî wasîteyêke hevtêgihîştinê pê ve çî ye? Xema nake mirov bi çî zîmanî bipeyive, tiştê girîng ew e ku mirov jî hevdu fam bike û karibe çareyan jî derd û kulên înternasîyonalîzmê re bibîne û bi awayekî global li meselê binêre, dema ku çare jî pîrraniyê re hate dîtin, jî xwe hîndekahî jî di nav de ne û ew jî qezencê jê dibînin.

Ji berê de hatiye gotin, "Ew kesê ku di pevçûnê de bibeze kevirê mezin, xêr di wî de nîn e û ew nikare tu rûnî bi ser dew xîne"

Mirov dibîne Kurd ecêb jî hev re qurê û pozbilind in lê jî xerîban re wek pisikan xwe dimelisînin. Ma kengî Kurdek jî bo li hevhatinê diçe rûyê Kurdekî din. Her divê yek jî herduyan yê din safî bike û jî meydane bide rakirin. Dibêjin şaheki Îranê soz da İsmail Axayê Simko ku heya ew li ser erdê be ew wî nakuje û bi qurban, pêxember û ewliyan sond xwar. Hîngê İsmail Axa çû hevpeyîftina wan. Lê şah jê re çalek kola bû û ser wê bi gul û çiçekan xemilandîbû, dema ku İsmail Axa hat û bi hespê xwe di wir re derbas bû, ew di çalê werbûn û di çalê de jî leşkerên Şah ew kuştin. Xuyaye em dersê hîç jî dîroka xwe nagirin. Em her tim bi dilekî saf û sade diçin cem dijminên xwe. Xwezî em wiha jî bi ew dilê saf û sade biçûna cem hevdu jî...

PEN kongreya xwe bi Siyabend û Xecê vedike

PEN'a Navneteweyî biryar sitand û dixwazin ku, kongreya xwe ya 58'an li bajarê Rio, bi filimê Siyabend û Xecê vekin. Ji xeynî vê jî, ji Amsterdam'ê û London û Köln'ê sazgehên fermî û yên serbixwe, ji bo pîrozbahîya (Gala) filimê muracaatê prodûktorê Siyabend û Xecê Turgut Senar kirin.


Murat Ergin

Filimê Siyabend û Xecê yê bi dengkirina (seslendirme) zimanê Kurdî qediya. Ev filim di sala 1991 an de bi zimanê Tirkî hatibû kişandin. Filimê Siyabend û Xecê hê derneketiye temaşekirinê jî, lê di qada navneteweyî de alaşeyek pîr mezin kişand.

PEN'a Navneteweyî biryar sitand û dixwazin ku, kongreya xwe ya 58'an li bajarê Rio, bi filimê Siyabend û Xecê vekin. Ji xeynî vê jî, ji Amsterdam'ê û London û Köln'ê sazgehên fermî û yên serbixwe, ji bo pîrozbahîya (Gala) filimê muracaatê prodûktorê Siyabend û Xecê Turgut Senar kirin. Filim, li Amerîkayê û

li Ewropayê vexwendiyê 2 festîwalan kirin. Li aliyê din Rêxistina Efû ya Navneteweyî (Uluslararası Af Örgütü) bi prodûktor Turgut Senar re hevdîtinek çêkir. Di vê hevdîtine de serokê PEN'a Kurd û senarîstê Siyabend û Xecê, Hüseyin Erdem jî hebû. Di hevdîtine de rêvebirên Rêxistina Efû ya Navneteweyî, gotin "Ji bo ev filim bikeve programa me ya perwerdehiyê, emê bifikirin."

Yeke din, ji bo mafê weşandina vê filimê, TV ya BCC û hinek sazgehên televizyonên din jî muracaat kirin. Filimê Siyabend û Xecê wê di demeke nêzik de, li sînemayên dinyayê were nîşandan. Dengkirina Filimê di situdyoyên Sazge-



Sahneyek ji filimê Siyabend û Xecê.

ha Televizyona Alman de(VDR) hatiye çêkirin. Dengkirina Siyabend û Xecê yê orjînal bi zimanê Kurdî ye. Lê filim, bi zimanên Îngilîzî, Almanî, Fîransî û bi Tirkî hatiye binivîskirin (altyazî).

Senar Film, bi vî filimî muracaatê Festîwala Antalya, ya Filîman kir. Lê mura-

caata wan qebl nekirin. Li gora Senar Filmê, ev filim ji ber ku bi zimanê Kurdî ye, nehatiye qeblkirin. Çavkaniya çîroka (senaryo) Siyabend û Xecê ji destaneke wêjeya Kurdî ya devkî, ji çîroka evîni derketiye. Çîroka vê filimê Hüseyin Erdem nivîsiye. Aktorên filimê jî Tarık Akan,

Mine Çayıroğlu (Tu dibê qey ji wê pêştir kesek ne mabû.) û Yaman Okay in. Muzîka Siyabend û Xecê muzîsyenekî Alman Ken. B.Wood, ji muzîkên Kurdî berhev kiriye. Di çêkirina vî filimî de milyarek pere çûye. Lê încax di dawiyê de bi alikariya VDR'ê filim qedandine.

Swêd, Welat- Li paytexta Swêdê roja yekşemê civînek li dar ket. Civîn ji teref YRWK ve hatibû çêkirin. Civîn ji bo bîranîna şehîde nemir Musa Anter hat çêkirin. Zêdeyî sed kesî beşdarî civîne bûn. Di civîne de lawê Musa û biraziyên wî jî amade bûbûn. Civîn bi deqîqeyekî bê dengî ji rêzgirtina şehîdan dest pê kir. Li ser navê YRWK axaftinek hat kirin. Di axaftine de, li ser rewşenbîrî û rola rewşenbîriyê û rola ku Musa hilgirtibû ser milên xwe, hate sekinandin. Piştî vê axaftinê, hevalek ji ERNK ê li ser rola şehîdan û wateya şehîdbûnê axaftinek kir û li ser cihê Musa sekinî. Piştî biraziyê Musa qise kir. Li ser jiyana wî ya siyasî sekinî û qala nivîskarî û fedekariya wî kir. Di dema xelesbûna civîne de endamên YRWK û çend beşdar, bi firehî li ser şexsiyeta Musa sekinin. Civîn bi peyva li dûçûna rêza Musa re tewaw (xelas) bû.

Rojnameya Dagens Nyheter, rojnameyê rojane ye ku li Swêdê diweşe. Rûpelê vê

Civîna YRWK li Stokholmê

rojnameyê yê duwemîn, yê birêvebiriya rojname ye ku di vî cihî de dîtînen xwe yê fermî dinivîsin. Roja 4'ê meha Cotmehê de vê rojnameyê de dîtina wan (ya demî) li ser rewşa Kurdistanê hat diyarkirin. Naveroka nivîsê li ser şerê di navbeyna PKK'ê û rejîma Tirkîyê de bû. Rojname dîtina xwe wiha diyar dikir: Belê deng û behsên kurte kurt ji me re tên. Ev xeber dibe ku ji aliyê deng û behs an de, ne têr û tije bin. Gelek ji nûçeyan li ser şerê di navbeyna gerîla û rejîma Tirkîyê de ye. Em dixwazin bêjin ku ev şer ne şerekî wiha biçûk e. Gava mirov li van deng û behsan binêre û biryara xwe bide, dê mirov şaş biryarê bide, ev biryar dikare bibe sedem ku sibê an jî di pêşerojê de qirkirinên mezin li wir biqewimin. Pêwist e mirov li ser vê pirsê bifikire û ji bo sekinandina

şer kar bike.

Li gorî deng û behsên ji wir tên ku ev deng û behs gelek caran

b i



sansur

in. Mirov tê digihîje ku li wan deveran bûyer hene û qirkirin çêdibin. Û mirov fam dibe ku li wir şerekî mezin heye. Ji sala 1984 an û vir ve, di vî şerî de 5000 kes mirin e. Ji ber ku şer niha germtir e, nivê van kesan îsal mirin. Şer her ne li bajarekî ye, lê hemû deverên Kurdistanê daye ber xwe. Girtinên bi tevayî li wir

dibin û nerehetî xuya dibe. Her di bûyera Şîrnexê tenê de 200 kes mirin.

Ji bo sekna şer tu tişt nehatiye kirin û rewş ji aştiyê dûr e. Serokwezîr Süleyman Demirel ji xeynî xeta leşkerî pê ve, tu riyên din beyan nake. PKK jî rîya xelasbûnê bi şerê

çekdarî didomîne.

Pêwist e ku welatên Rojava yê Ewropayê jî li ser vê rewşê bifikirin û li ber çav bigrin. Ev siyaseta Tirkîyê ya durû, ku ji aliyekî qala demokrasîyê dibe û ji aliyê din ve xwîne dirijîne qet li hevûdin nake. Rewşa Tirkîyê divê li ber çavan bête girtin û welatên Ewropayê, wan ji bo li hev hatinekê li ser masê bidin rûniştandin, û rejîma Tirkîyê bidin zorê.

DAXUYANÎ

Wê Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan (YRWK), konferansa xwe ya yekemîn di mējûwa 16-18.10.1992 an de, li bajarê Bonn ê li Almanyayê çêbike. Em hemû rewşenbîr û welatparêzan vexwendiyê konferansa xwe dikin.

Cihê konferansê:

Jugend-Gastehaus horizonstr.60,
5300 Bonn -Bad Godesberg

Tel: (228) 31 75 16

Ji bo tēkiliyan: YRWK

MAX STR - 50.52 5300 Bonn / 1

Tel: (228) 63 09 90 Fax: (228) 63 07 15


**Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan
Komîteya Kargêr / YRWK**




Ehmedê Xanî



Seyid Riza



Musa Anter



Egîf (Mahsum Korkmaz)

Şopa xwe hiştin û çûn

Du hefte beriya şehîdbûna te (Apê Musa); te dixwest ku bibî perçeyek ji "Ala Kurdistanê". Tu bawer ke Apê Musa; tu gihîştî armanca xwe. Beriya ku ez, serpehatiyên te bînim ziman, dixwazim çend gotar û gotinên girîng ji filozof, rêber, gernas û ji şehîdên Kurdistanê şîrove bikim ku, careke din em, baş têbigihîjin hûn "Şehîdên Kurdistanê" çi qas bi rêzî (ihtiramî) rêça hevûdu dişopînin û şîretên we yên bi rûmet ji bo rêhevalên we çi ne?..

"Herçî bire şûrî destê hîmnet

Zebt kir ji xwe re bi mêrî dewlet

Bê ceng û cidal û bê tehewir

Qet vê şûxlê mekin tesorî" Ehmedê Xanî

"Ez dizanim hûnê me bidarvekin (îdam bikin) lê, ev nav û gotinên ne rast li me nekin, wek "Karbi-destên Brîtanî û paşverû" Xûda şahîd e me, ji bo welatê xwe Kurdistan û ji bo mafên Kurdan xebat kiriyê. Bedena min a fîzîkî ji vê dinyayê koçbar dike ezê ji bo Kurdistanê şehîd bibim, lê ez, pirr bawer im ku neviyên me (torinên me) wê tola (heyfa) me ji zaliman bistînin û welatê

me rizgar bikin." Şêx Seîd "Ez 75 salî me, şehîd dibim, bi vî dirûvî ez jî, tevî karwanên şehîdên Kurdistanê yên bi rûmet dibim, serhildana Dêrsimê niha têk diçe, lê wê Kurd û Kurdistan her tim bijî, xortên Kurdan heyfa me nahêlin, wê tola me ji zalim û dolê qehpan bistînin, bila bimre zalim û zordestî! Bila bimre dolê qehpan û derewker! Bijî Kurd û Kurdistan... Bi zaravê dimilî-zazakî." Seyid Riza

Bi navê Nuhê huveylî, İzzet Beg û eşîra wan li dijî dagirkerên dewleta Tirk şerekî gelek dijwar didomînin. Ji ber dijwarbûna şertên wê herêmê, xwişka Nuh Gulnaz Xatûn dişeynî Mûşê, di encama vî şerê dijwar de birayê Gulnaz Xatûn İzzet Beg û lawê wî Sedîq Beg şehîd dibin. Lê serbazên Tirk, van şehîdên Kurdan nas nakin. Ji ber vê yekê bi dirûvekî hov serê wan jê dîkin û dibin Mûşê nîşanî Gulnaz Xatûn didin. Gulnaz Xatûn li van seriyên jêkirî mêze dike û xwe li ber serê birayê xwe xwar dike. Bi dengekî bilind pesnê birayê xwe İzzet Beg dide, gelek qehremaniyên wî dijmêre. Dûre diçe ber serê lawê xwe Sedîq

Beg, destê xwe li ser çavên wî digerîne û wiha dibêje: Ev tosinê min e, min ji bo van rojan şîr dayê, ger ku ji bo doza Kurdistan min serê wî yê jêkirî nedîtibûya, min ê şîrê xwe jê re helal nekira, lê bira şîrê min ji te re xweş helal be kurê min...

Xakî Kurdistan bi qurbanî pirr ciwan û paqijî

Xwîn rijandin pirr kurên te va li her alî rijî

Miletê Kurd ta ku sax e ew ji vê rê nagerî

Aferî sed aferî Qazî Mihemed aferî... Cegerxwîn

"Em, li gorî pêwistî û girîngiya rewşa welatê xwe têkilî bi însanan re datînin. Ger pêwist be saetek bi însanan re diaxivin, ger qanî nebin deh saet diaxivin, cardin qanî (iqna) nebin çil saetên xwe didin lê, însanan ji bo têkoşîna rizgariya welat bi bawer dikin û em ê bikin jî..." M. Hayri Durmuş / Li dadgeha Tirk ya Amedê.

"Ger ku berxwedan a me ya li dijî dewleta dagirker di nav diwarên zindanan de bimîne, ev dirûsmên me (sloganên me) li serê çiyayên Kurdistanê bersiv negre, bê bersiv bimîne, wê çaxê dewleta faşîst û dagirker wê bigihîje

armanca xwe." Mazlum Doğan / Li zîndana Amedê

Li zîndana Amedê, serbazê Tirk Esat Oktay Yıldırım ji Kemal Pir re wiha dibêje: "Kemal! Em êdî bi masiyên mezin mijûl dibin, bi masiyên mîna te, bi masiyê herî mezin ê vê herêmê re muxatap dibin." Bersiva şehîdê nemir jî wiha dibe: "Komitanê biçûk, bala xwe baş bidê; masiyên mezin bi hêsanî nayên daqurtandin, ji ber ku, masiyên mezin xwedî dasiyên mezin in..." Kemal Pir

"Agirê Newrozê bi dar û zeviyan pirr gurr û geş nabe, em wek milletê Kurd; girîng e ku agirê Newrozê bi canê xwe gurr û geş bikin." Zekiye Alkan / Amed

"Ez bûyerên Newroza 1992 an ku li bajarê Kurdistanê, li Şîrnexê û Cizîrê bi qetlîamên dewleta Tirk a faşîst pêkhatin, protesto dikim; li hember bêdengiya dinya yê canê xwe feda dikim û xwe dişewitînim..." Raşan Demirel

"Ger ku aqil bi mantiq ve, mantiq bi cesaret ve, cesaret bi zanahî ve, zanahî bi çalakî ve (eylem) neyêt girêdan û meşandin; ew millet an jî civak, çi qas

bi cangorî (fedakar) û çiqas çalakî dike bila bike ew, tucar nagihîje armanca xwe û ji serkeftinê û ji serfirazî yê bê par e..." Mahsum Korkmaz

Tolhildan!
Tolhildan!.. Ji bo paqijkirina gemar û lekeya li ser namûsa Kurdan.

Tolhildan!.. Ji bo aşkirin û rawestandina qîrîn û feriyada bi sed hezaran zarakên Kurd, ku bi pozê singû û xenceran têne kuştin.

Tolhildan!.. Ji bo rawestandina nalîna keç û bûkên Kurd, ku di berbanga sibê de di xironek û di agirên dijwar de hatin sotan.


Tolhildan!.. Ji bo bi cihanîna armanca bi hezaran cangor û lewendên ku, di bin sê dar (darvekirin) an de bang dikirin! Bijî Kurdistanê serbixwe û azad... Ku bi vî rengî gihane tax û taca şehîdan.

Tolhildan!.. Ji bo avêtina keftar û çeçelan tevî laşê wan ê genî û gemar ji xaka paqij ya Kurdistan.

Tolhildan!.. Ji bo rawestandina hewt hewta kuçikên ku di bin siya "Medeniyetê de êrîş dikin ser Kurdistan.

Em bawer in wê dengê me bê te, Apê Musa yê Kurdistan...

EVÎN



Tabloyekê wênekêş (resam) Gulixanê Mehmet Gurcistan, Tîblîsî

M. Azizoglu

Evîn ji her tiştî cihê ye. Evîn; bi dil û can ji wê/wî/wan/ hezkirin e.

Wek: Evîna wê ji bo wî an ji evîna wî ji bo wê; evîneke di nav du mirovan de ye. Evîna ji bo çiya ew e ku, mirov ji binê çiya ta serê çiya, çi hebe hemûyan di dilê xwe de dihebinê (jê hez dîke). Kevir, zinar, giya, dar, çiçekên reng bi reng, ava zelal ku ji cemedê sartir e, hewa paqij ku bêhna mirov vedike, mirov dike evîndarê xwe.

Evîna ziman evîneke wisa ye ku, mirov bêyî vê evîne, tu carê nikare xwe dilşad bibîne. Lewre ziman hebûna mirovekî/ mirovekê ye. Bi ziman, mirov bi derdora xwe (daxwazên, pêwistiyên, nexwe-

şiyên hwd.) xwe dide famkirin. Ji bo vê yekê divê mirov zimanê xwe bi evîni biparêze. Çawa mirov dikare evîndarê tiştêkî din be, çima mirov wê nikaribe evîndarê zimanê xwe be?

Dema em bi zimanê xwe bipeyivin, divê em şerm nekin. Ev ziman ji kal û pîrên me, ji me re diyarî maye. Kêmasiyên me hemûyan hene, ev hezar sal e ku welatê me, di bin destên hovan (barbaran) de hatiye pelçiqandin, zimanê me hatiye qedexekirin, dewlemendiya sererd û binerdê welatê me, hatiye talankirin.

Konevaniyên pişavtinê siyasetên asimilasyonê yên welatê mêtîngehkar (her çiqas bi hezaran gelê Kurd şehîd dabe jî)

bi ser neketine. Îro, gelê Kurd dîsa wek her car, li ser lingan, li bajar û gund, li deşt û çiya, bi dîlan û tilîliyan, li dijî van hovan, ji bo pêşerojê serfiraz şerê xwe dîke.

Evîni gelek giranbûha ye, lê evîniya welat giranbuhatir e.

Dema mirov evîndarê welatê xwe be, bi dil û can jê hez bike, wî bi her awayî biparêze û lê xwedî derkeve, dê naveroka evîne hê xwestir, geştir, serfiraztir û bi rûmettir bibe.

Evîna Kurdistan, evîna mirovahiyê, evîna hemû rawirên li ser rûkê erdê, çûkên (çivîk) li esman, masiyên nav avan, evîna dar û zevî, çiya û gelî, deşt û berrî, mîrg û kanî ye. Ev ji welat nayên cudakirin.


SPASÎ

Em ji hemû kesên ku, li ser kuştina serokê Enstituya Kurdî, damezrewanê Weqfa Çanda Kurdî, mirovê hêja, zana û nivîskar û malxweyê min,

Musa Anter

ji welat û ji derî welat bi tazî û mesajên xwe bûne şirikê êşa me re spas dîkin.

Li ser navê malbata wî
Hale Anter



AZADÎ

Abdurrahman Durre



Bîranîne Mamê Musa

Xwendevanên hêja, di nivîsara me ya bi navê "Warê şehîdan" de helbestek min î li ser Mamê Musa pirr xeta û çewtiyên teknîkî tê de çêbûne. Bi baweriya min rihê Mamê Musa yê ezîz jî pê rencîde bûye. Lewre, tim ji min re digot "Miftî helbestên te pirr û pirr xweş û hêja ne, hemû weke helbestên klasîkî yê Kurdî ne, bi wezna arûzî ne; divê tu di demek nêzik de dîwana xwe çap bikî. Yeqîniya min ew e ku rihê Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Seydayê Cegerxwîn.. û şaîr û alimên Kurd yên din, dê bi helbestên te pirr xuşnûd û şa bin."

Ji xwe pêşeka dîwana min a yekemîn jî ku bi navê "Evîna Welat" e, Mamê Musa nivîsiye ku di van rojan de, wê bê weşandin di wê pêşekê de jî

Mamê Musa, di dilê hemû Kurdan de û di dilê min de jî pirr û pirr ezîz û şîrîn e. Bêyî wî jin li min bûye şîn, cîhan li min bûye zîndan. Dîsa jî em dibêjin rihê wî yê ezîz şa be, li ser axa wî ya pîroz jî bi hezaran rehmeta Xweda be.

Mamê Musa pirr pesin û sitayîşên xwe yê hêja li ser wê diyar kiriye. Ji ber ku Mamê Musa, di dilê hemû Kurdan de û di dilê min de jî pirr û pirr ezîz û şîrîn e. Bêyî wî jin li min bûye şîn, cîhan li min bûye zîndan.

Ez dixwazim ku wê helbestê bi rastî, ji bo we dîsa biweşînim. Hêvîdar im ku rihê Mamê Musa pirr memnûn û şa be. Lewre min tim jê re digot "Tu jî Musayê Kurdan î, lê esayê te qelema te ye, Firewnên te jî ne yek in bi hezaran in."

Dîsa jî em dibêjin rihê wî yê ezîz şa be, li ser axa wî ya pîroz jî bi hezaran rehmeta Xweda be.

Gerçî pêxember ne bû, lê ew ku Musayê me bû Pênivîs, tim dest de bû, ew jî esayê wî he bû Xame, şûrê wî bû, cenga serfirazî pê dîkir. Ew jî wek Musa dijê Firewnê dewrana xwe bû Tim digot: Dê ez şehîdê Kurd û Kurdistan hebim Rast e, va wek Şêx Seîdê ku'l Diyarbekirê we bû Çû wekî Mîrhac û Qazî, bû şehîd wek Şêx Seîd Hem şehîdê serfirazî, hem gula baxê me bû Sed hezar rehmet li axa wî be, Musayê welat Dijminê har mixennet, lê be le'net, qehpe bû.

APÊ MUSA

Şervanê azadiya gelê Kurd û demokrasiyê, mirovê aliyê zanistê, Musa Anter, Apê me li Amedê, ji aliyê hêzên dewletê ve hate qetilkirin. Em vê cîneyetê protesto dîkin.

Têkoşîna Musa Anter rîya me ronahî dîke.

Serê gelê me sax be.

Saim Bayram
ji Girtigeha Afyonê

Welatêki de mordemek beno, jû jî ciniya xwe bena, ciniya na mordemî zaf înatkare bena; roze mordemek ciniya xwe ra vano, "cinik min re çorva bipoze". Cini-ke sona bûlxûr pozena, mordemek vano; "cinik min re bûlxûr bipoze." Cini-ke sona çorva pozena.

Rozekî mordemek ciniya xwe ra vano, "cinik, ez son kolî, sîliye ke nêvore, qatire bîje bî, ma kolî barkeme biyarîme, eke xwe ra sîliye vorê, qatire meya, tû ve xwe bê" Mordemek torje ceno sono game, xeyle kolî keno hûrdî, sîliye kena pûro vorena, ca welax nêdana, nijadano ke cinike qatire gûreta wûza de vejîye. Mordemek hen ke qariyo, vano, "cinik, mi tû ra va ke sîliye ke vore qatire meya! Tû ça qatire arde?" Cinike vengê xwenêkena. Qatire ceno vere mordemekî ra vêrena ra sona. Mordemek vano, "cinik wûza de meso! Qûla verê tû de esta, gine-na pûro."

Cinike qeytan gos nêdana sona, qûla ro sona cer. Mordemek nijadano ke, cero vengê zirçenî ame, xwe xwe re vano, "na çixa ke xiravine vo jî, ciniya min a, vinde ez naye qûle ra vejîne." Mordemek sono dijarê qûle, rese pûro verdano ro, nijadano ke jû cero rese ro woncino, deqê tepeya nijadano ke, dêve qûle ra rese ra onciya ame ser. Cinike jî ništa ro vilê dêvî, hetê ra jî

Înatkare

AREKERDOX: WUSXAN

gosû woncena. Dêv jî hen ke zirçeno, dîna keno letey. Mordemek dêvî ra vano, "aye berze bine, aye berze bine!" Dêv xwe saneno ra, cinike pûro erzeno bine. Dêv mordemekî ra vano, "tû ez aye ra xelesnûne. Biwaze, min ra çi wazena biwaze!" Mordemek vano, "pirçê xwe ra hîre mûyû bide min." Dêv hîre têl mûyû dano mordemekî, vano, "tû ke na mûy vêsna, çi wazena hen beno." Mordemekî ra vano, "nijade, tû ke rey-na rastê min vejîya, tû wen!" Dêv beno vind sono. Mordemek jî têlû ra jûye vêsno, sir beno sono peyê hot kowû de sûke de vejîno. Zerê sûke de fetelîno, sono verê sarayiye de vejîno. Nijadano ke, verê saraye pêro pirê qûlî yo. Pers keno, vano "nû çiko? Na millet ça tika biyo top?" Ci ra vanê, "çena pasay biya nêwes, kam ke ci re dêva dî, pasa çena xwedano dey." Mordemek sono çeverê sarayiye eskerû ra vano, "şerê pasay ra vazê, çena dey biya nêwes, deva min dera," Eskêr vanê, "honde welatû ra tavîv amey, kesî deva nêdî. Tû kotî ra vînena?" Mordemek vano, "sima

şerê pasay ra vazê." Eskêr sonê pasay ra vanê, pasa vano, "bêro!" Mordemekî wazenê verê pasay. Pasa vano, "halmezal niya. Çena min hot asmî yo biya nêwes, kesî ci re deva nêdî." Mordemek vano, "ez çena tû re deva vînen." Mordemekî benê woda çeneke. Mordemek woda ra qûlî keno tever. Mordemek û çena pasay teyna manenê. Mordemek verê pisa xwe ra mûye vezeno, fino ra ci, duyê mûye dano ra firna çeneke. Çeneke bena wes û war, wûrzena ra. Pasa çena xwedano mordemekî. Çewres roze, çewres sewe veyve keno. Mordemek saraya pasay de nîseno ro, linge erzeno linge ser, çefê xwe de nijadano. Dêv jî sono zovîna welatê de kûno firna çena pasay, çena pasay bena nêwes, ginena cilû ro. Pasa her cayê dîna ra tavîvû ano, qeytan jû ci re deva nêvînen. Fendê mordemekî sono gosê pasayê yî welatî. Pasa xevere rûsneno, havale xwe pasay re vano, "çena min biya nêwes, se kena bike, zamayê xwe birûsne." Pasa zamayê xwe rûsneno, eve zamayê xwesa beno.

Zama sono saraya pasay.

Benê leyê çeneke. Zama û çeneke teyna manenê. Mordemek verê pisa xwe ra mûye vezeno, vêsno, dûma dano ra firna çeneke. Dêv ci ra vejîno, mordemekî ra vano, "mi tû ra va ke, rey-na min rî ro mevejîye, tû

wen. Ça wonca vejîya?" Mordemek vano, "ez zannen. Hema ciniya min a vîrene amê, coka ez remûne amûne na welat." Dêv vano, "weye, ciniya tû ke heta wûza ama, heta tika jî yena, ez na welatî jî caverdan, ez çik ne na welat çik o? Na hard min re heram bo." Dêv wûza jî caverdano, çimû ra beno vind. Mordemek a çeneke jî ceno, ceno ra yeno saraya xwe, eve di cînû sono reseno mirodê xwe.

Ey Berzanî û Telabanî


Lingekî we li Tirkîyê yek li Amerika
Li ba dijminên Partiya Karkeran û
Hemû Kurdên bi namûs û hêja
Ma qey ne bes e ev koletîya we
Ji dijmin re wek bav û kala
Îro we dev ji dijmin berdaye
Rahîştîye hemû çekên xwe û
Berê xwe daye birayên xwe
Hûn li benda rutbeya ne ku dijmin bide we
Gelek eyb e ji we re îro
Hûn miradê van Tirkan û neyaran li me tînin.
Lê belê hûnê dîsa bîn ber deriyê me
Dîsa bi talîmata partiya me em ê guh bidin we
Em ne wek we xayîn in
Dîsa li her çar parçê Kurdistanê
Încex ala rengîn rake
Ev Partiya Karkeran
Me navê azadiya bi minet me navê
Încex bide me serxwebûna me serokê me
Û reberên me yên li ser çîyan

Newroz Deniz

XACEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Nivîskar, zanyar û filozofê Kurd, apê Kurdan, şehîdê nemir. Di wênê de tê dîtin/ Yekemîn 2-Dîl, girtî/ Navê çivîkeke kûvî 3-Xewa kûr û giran/ Çivîkeke leşxwer 4-Navekî mêran/ Çêbûyî, gihandî, navekî mêran 5-Bêziman/ Ixtiyar, pîr/ Ji yekî daxwaza nekîrîna tiştêkî 6-Navîn/ Kinnivîsîna ajansêke nûçeyan li Tirkîyê 7-Nivîskarekî ji Şilî 8-Bi crebî 'ez'/ Dî notayê de dema seknê 9-Nebatek, bi pirranî di araqê de, tê bikaranîn 10-Sembola Lîtyûmê/ Testa tesbîtîkirina Aids'ê
Şerejêr: 1-Gotinên pêkenîkî/ Sembola dewletan, beyreq 2-Kinnivîsîna Amerika/ Agir/ Cephe 3-Wergêriya zimaneke biyanî ya ji dev bi dev, bi pirranî di konferans û civînan de tê bikaranîn, yê wergêr ji yê beşdar re, ji devê yê ku axaftin dike wêrdigerîne 4-Li Bakurê Rojavayê Kurdistanê çemeke mezin/ Cihê ku gundî berhemên xwe lê difroşin, bazar 5-Kin, eks/ Dîn 6-Sembola Nîobîûmê/ Notayek/ Tiştê ku bêhn pê ketibe 7-Firaqek ji bo vexwarinê/ Li Rojavayê Asyayê navê welatek 8-Qebile/ Yan, ya/ Notayek 9-Celebek berhemê edebiyatê 10-Melayê fileyan, papaz 11-Xweliya hûr, bi kêrî ziwakîrîna hibrê (murekebê) tê



12-Xwendekar, şagirt, telebe
BERSIVÊN XACEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ
Çeperast: 1-Jan Dost/ ERNK 2-Îslam/ Îsrail 3-NY/ Aram/ Sa 4-Sazgeh/ Leman 5-Resen/ Nan 6-La/ Hîser 7-Li/ RTL 8-Morî/ Est 9-Azîne/ Or 10-Rîs/ Sênî
Şerejêr: 1-Jînsal/ Mar 2-Asya/ Alozi 3-NL/ Zr/ Îris 4-Dadgeh/ În 5-Om/ Esîr/ Es 6-Aheste 7-Tir/ Nelson 8-Sal/ Trî 9-Ermen 10-Ra/ Ma 11-Nisan 12-Klan

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmarê pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkîyê û li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.


Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad.

Atay Apt. No:5 Kat:1 D:4 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 511 57 60 - 511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM



Şengilo mengilo alîçengilo

Dibêjin carekê di daristanêke mezin de bizinkûviyêke jîr û bi rûmet jiyabûye.

Bizinkûvî bi navên Şengilo, Mengilo, Alîçengilo sê heb çêlik (karik) ê wê hebûne.

Malbata bizinkûviyê pîr bextiyar bûye, sibê zû ku ji xewa şîrîn şiyar dibin dest û rûyên xwe dişon, taştê dixwin, hinek bi hevdû şa dibin û bizinkûvî li çêlikên xwe tembîhan dike, dû re ji mal derdikeve diçe nav daristanê ku biçêre... Tembîha wê ya mezin ew e ku ji xerîban re derî neyê vekirin. Lewre di nav vê daristana bêserî û bêbinî de gelek (heywanên) sewalên neqenc hebûne. Ku bi wan bihisin wê werin çêlikên reben bixwin.

Bizinkûvî dema ji mal derkeve ji çêlikan re dibêje: "Heta ez neyem, hûn li kesekî derî venekin. Dema ku ez hatim ezê li ber derî bisekinim hûn di vê qulika derî de li piyê min ê spî binêrin û dûre dengê min ê ku ezê bêjim Şengilo, Mengilo, Alîçengilo dayika we çûye zozana şîr ketiye guhana hindik ma were dana; ku we bihist û bawer kir ku ez im paşê derî vekin.

Çêlik vê tembîha han pîr girîng dizanin û ji dayika xwe re peyman didin ku tim û tim

caran wilo bikin.

Birastî çêlikên jîr her roj bi vî awayî dikin. Dayika wan ku diçe, ew jî deriyê xwe mehkem dikin û di hundir de ji xwe re dileyîzin heya êvarê. Dayika wan tê ber derî pêşî di qulikê de li piyên wê dinêrin ew jî parola xwe dibêje, dûre ku dayika xwe nas dikin derî lê vedikin. Êvarê heya dereng bi hev re dileyîzin, şa dibin, dayik ji wan re çîrokên dibêje. Bi vî awayî rojên xwe didomînin.

Gurêkî pîr û birçî bi çêlikan dihise. Gelek fênd û fundan dike ku van çêlikên xweşik noşîcan bike. Tê nêzîkî malê li wan guhdarî dike. Dengê Şengilo, Mengilo, Alîçengilo ku dibihîze zimanê xwe li lêvên xwe yên qalind û reş û pîş dixê, dialêse. Dibê ax gelo minê kengê ew bixwarana. Dawiyê parola dayika wan hîn dibe.

Rojekî bizinkûvî di nava daristanê de, dûr diçe, gurê pîs tê ber derê wan bang dike:

- "Şengilo, Mengilo, Alîçengilo dayika we çûye zozana, şîr ketiye guhana, hindik ma were dana."

Şengilo tê ber derî di qulikê de lê dinêre piyên spî nabîne. Mengilo ban dike:

-Yadê ka piyên te ne spî ne.

Gurê pîs:

-Lawo çavê dayika we kor be, ez ji zinarê de ketim, piyê min xwîn bûye, lewra sor e.

Alîçengilo dibêje:

-Dengê wê ne ê dayika me ye, piyên wê ne spî ne, em lê derî venekin. Şengilo, Mengilo dilê xwe ji bo ketina dayikê dişewitînin û lê derî vedikin. Alîçengilo ji ber bi gotina wan qayîl nebibû xwe di cihekî de vedişêre. Dema gur ku dikeve hundir êrîş dike ser Şengilo, Mengilo bê cûtin qurî zikê xwe yê reş dike...

Bizinkûvî tê ber derî sosreke reşê giran dibîne... Qêrî dike "Kef-tarê pîr tu li vir çi dikî, kanê çêlikên min?" Gur dibê: "Metê bi serê bavê te heya min ji çêlikên te tune. Ez di vir re derbas dibûm niha rûniştim ku bêhn bidim."

Alîçengilo dibîne ku dayika wê hat hema ji nişkêva ji cihê xwe derdikeve û çîrokê ji dayikê re dibêje.

Bizinkûvî ya ku jana cigerê daye serî êrîş dibê ser gur, sturî (qiloç) yê xwe di zik re dike. Şengilo, Mengilo jê derdixê.

Gur dimre çêlik xilas dibin. Çêlik careke din peyman didin ku careke din xeletiyêke wilo nekin.

Berhevkar: Rasto Zilani

Heydê heydê

1-Werz
Heydê heydê rab "Sî-pan"
Emê biçin nav "Werzan"

Bldin hev şimamoka
Girover wek bîhoka

Ew zebeşên xetxeto
Li serê lema diketo

Nav so re rengê xwînê
Dendik reş e bi xemînê

Tallik û ecûrên hûr
Bixê xurcîkê û tûr

Evîn, Bamî û Genek
Tevî hev in bê henek

Gûl berber tev de zer
Dora werzin seran ser

2-Rez
Heydê heydê "Bêrvan"
Emê biçin nav "Rezan"

Tev mêw û dar û ber in
Xet xeta seran ser in

Emê biçin nav "Dexlan"

Hêlinê çûka bibin
Dexil û zadên seridîn

Ceh û nîskê II gel hev
Nok û kizin II rex hev

Genimê sor şîr dike
Sinbil serî radike

Bê zîwan û genimok
Xurû genim sinbîlok

Şoqil û şollikên xweş
Li sînor û bux û bimesş

Wan qarot û qîvaran
Dem xweş dibê êvaran

4-Gulistan
Heydê heydê "Perîşan"
Emê biçin "Gulistan"

Tev gul û bax û çiçek
Hemû reng in, sor zerek

Nefel û rihan bibin
Tê bîra mirov evîn



Bihîv û gûz û berû
Li navê mêw in xurû

Şabelot, darê tiwa
Kê m dar xuyane ziwa

Xemla mêwê goşî ye
Ji Xwedê re hiştîye

Ew tiriye goşî reş
Pê rehet dibê nexweş

Waye dara hirmiya
Xweş e sêva guliya

3-Dexil
Heydê heydê rab "Ci-wan"

Şaxbigula neşkîne
Gul darê dixemlîne

Ser glya bik "babûtan"
(1)
"Tûştê" (2) û "Çira" (3) giran

Lê bilîze bi şahî
Ta ku hebe ronahî

Wê çaxê vegere mal
Tev hogir û yên heval

1-Lîskek xorta ye.
2-Ew jî lîskek xorta ye, weke "Çirê".

Konê Reş / Suriye

Navekî giran malekî wêran!

Dema ku serhildana Başûrê Kurdistanê çêbû, wê demê serokên partiyên wê perçê li Îranê, Ewropa û cihên din li derveyî welêt bûn. Gel bi serê xwe rabû ser darê piyên xwe, li hember hovîtiya Sedam û dezagahên wî serî rakirin. Serok û rêberên wan partiyên, hin bi erebeyan û hin jî bi siwarî, her yek ji leza (ecele) yê din hatin û ketin Kurdistanê.

Mîna axa û began, ku xulamê wan jî wan re karekî bi cih tîne û ew bixwe têne ser sifreya xwarinê. Her tişt jî wan re hazir û amade ye. Wan serê xwe bi tiştê ve ne eşand. Ew tim û tim jî xelkê dût bûn. Ji Kurdistanê derketibûn. Seranserê Kurdistanê ketibû bin destê hêzên Sedam. Sedam, êdî jî wan partiyên û hêzên wan neditirsî. Ew bi rehetî û bi dilê xwe ketibû nava gelê Kurd, tim bi şewitandina Kurdistanê û kuştin û jinavbirinê gelê Kurd ve mijûl bûbû. Tevaya leşkerên Sedam, ku şerê Îranê dikirin, dema ku ew şer temam bû, wî wan hêzan (teva), bi tanq, top û teyaran re anî ser devera Kurdistanê. Bi navê (Enfal) êriş kirin ser gundên Kurdistanê. Wê demê tu hêzek tunebû, yan çî partiyek jî yê başûrê Kurdistanê bi leşkerê xwe ve amade tunebû ku bersînga leşkerên Sedam bigire û xelkê Kurd jî mirinê rizgar bike.



Belê! gel bi serê xwe rabû, li hember dijmin sekinî û li ber xwe da. Êdî nema zilm û zordariyê qebûl bike. Bêyî ku kesek yan partiyek jî gel re bêje, ew bi xwe rabû ser piyên xwe û dijmin jî axa xwe derxist.

Êdî wek me got; dema ku dijmin bi hêzên xwe ve derket, serokên wan partiyên bi lez hatin Kurdistanê! Pîrrianiya serokên wan partiyên bi xwe jî, vî tiştî dibêjin.

Ew jî bo rizgarkirin, parastin û rêxistina gel nehatin. Ew jî bo, talankirin û perekomkirinê hatin.

Ji ber ku bi salan ew parti (mîna (PDK) û (KUK) ê) jî gel dût bûn, êdî nema ku bawerî-

BAŞÛRÊ KURDISTAN



HİKÛMETA KURDÎ

Memo— ji başûrê Kurdistanê dinivîse

ya gel bi wan tê. Gel bi serê xwe, karê ku bixwaze bi cih tîne.

Wan serokan, bi rêberî û însiyatîva mîrên xwe mîna Amerîka û jî bo ku xwe bi serê gel da bisopînin, hatin û go-

tin; em dê hilbijartinan çê bikin, gotin; her kes azad û serbest e, bira gel jî xwe re parlamaneke hilbijêre, bi riyek demokratî, bira gel jî xwe re rêberê xwe û nûnerê xwe hilbijêre. Lê wek me got; ku

wan ev kar bi plan û însiyatîva xwe nekîr, wan nizanîbû ew dê çî nav lê bikin Carna digotin: "Hilbijartina Meclîsa Kurdistanê", carna digotin: "Parlemanê Kurdistanê".

Wexta ku bi gel re di-

axivîn, ji bo ku xwe li ber dilê gel şîrîn bikin, digotin: Em dê parlemanê Kurdistanê çêkin ji ber ku em dixwazin em serbixwe bin.

Wexta ku bi rojname, radyo û televizyonên biyanî re deng dikirin digotin: Ji ber ku Sedam dam û dezagahên xwe ji devera Kurdistanê birine, boşayiyek (valabûn) îdarî li devera Kurdistanê çêbûye. Em dê meclîsek Kurdistanê çêkin, da ku wê boşayiyê jî holê rakin, divê jiyana xelkê raneweste. Armanca me ne cudabûn e.

Di xewna wan partî û serokan de jî tunebû ku carekê ew dê karibin bikevin Kurdistanê. Derketina hêzên Sedam ne bi kar û plana wan bû. Ne jî gel bi wan re bû. Lewre, wexta ku ew hatin mijûliya wan firotin, talankirin û dizîna tiştên Kurdistanê bûn, ku heta îro jî her dixwin û tîr nabin!! PDK û KUK her tiştî di navbera xwe de parî dikin, di dizîna û revandina tiştên mîna bildozer, trombêl û makînen mezin de alîkariya hevûdu dikin. Her tiştî bi şîrkatî dikin. (Parlemanê Kurdistanê) jî, her bi vî awayî, wan di navbera xwe de çêkir. Ji xwe re û li gor ku dilê wan bixwaze, listeyên navan çêkirin û dane dengdanê. Dema ku netîceya dengdanê derket, ew bi hevûdu re rûniştin û kirasê Parlemanê li gor dilê xwe çêkirin. Bi fêlbaziyên xwe, rê li ber her kesên din girtin. PDK û KUK li hev hatin ku her yek jî wan jî %50 kursiyên parlemanî bigire û gotin; vaye gel me hildibijêre!!

Wexta gel dît ku vana dizin, dizî dikin, li ser diziyê hevûdu dikujin. Êdî nema gel karê wan qebûl bike, ketin cadeyan û li dijî wan saloxe û dirûşmeyan avêtin. Lê ev ên ku xwe bi demokratîyê nîşan dabûn, ketin nava gel, yê ku ne bi wan re bin û tişkî li dijî wan bêjin, wan tîxin zindanan.

Belê! Tiştê herî pêşîn ku hikûmeta Mesûd Berzanî û Celal Telabanî jî gelê Kurd re çêkirine zindan in!..

welat

• Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezagahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır • Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat • Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul • Tel:511 57 60 - 511 66 02 • Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715 • Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France • Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ